

BERBANG

Organa Federasyona Komelen Kurdistanê Li Swede ★ Sal:6 Hejmar 4/87 (42)



BERBANG

Organa Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê
Organ för Kurdiska Riksförbundet

Berpirsyar / Anavarijtgivare:

K. Îzoi

Serekredaktor / Cefredaktör:

R. Zilan

Redaksiyon / Redaktion:

M. Bekir, J. Kurdo, R. Simo, C. Hayderî

Karê teknîkî / Sättning och layout:

Broyê Macîr, Bavê Rojbîn

Navnîsan / Adress:

BOX 45205

104 30 Stockholm.

Telefon:

08/ 68 60 60

Postgiro:

64 38 80 — 8

Abonetî / Prenumeration:

Kes / Enskilda: 100 Skr. / sal/år

Meqam / Myndigheter: 200 Skr./sal/år

Agahdarî / Annonc:

Rûpela paşîn / Baksida: 2000 Skr.

Rupelên navîn / Insidor: 1000 Skr.

Nîvrûpel / Halva sidan: 500 Skr.

ISSN — 0281 — 5699

Redaksiyon ne berpirsyarê nivîsarên îmze û axaftinên
Federasyonê ye. Nivîsarên ji Berbangê re tîr şandin,
heke çap ji nebin, li xwedî nayên vegeandin.

Berga pêşîn:

Serokwezîrê Swêdê Ingvar Carlsson

xelata Şerko Bêkes dide

Foto: B. A. Ignell

Berga paşîn:

Afişa musabaqa folklorê

Sal: 6 Hejmar: 4/87 (42) 3.9.1987

NAVEROK

Bînahiya çavên me, Şerko Bêkes.....	3
	Reşo Zilan
Hevpeyvînek bi wezîrê biyaniyan re.....	5
Mihemed Arifê Cizîrî.....	8
	Faxredîn Gerdî
"Kurdistan ne tenê yek perçe ye".....	10
Ji komelên endam.....	12
Pêşwazî le Şerko Bêkes.....	23
	Hesen Qazî
Rû le Swêd kirdinî kurd.....	21
Çend pêşniyar ji bo Berbangê.....	20
	H. Ferec

Xwendevanên Hêja,

*Em hêvî dikin ku we havîneke xweş derbas kiri-
be. Herçendîli Swêdê di mehên havînan de xebat û
karûbarên rêxistinî li Swêdê kêmtir dibe jî, me wek
Federasyon, xebata xwe bi awakî normal birê ve bir.*

*Di destpêka havînê de xebateke berbiçav ji bo
kampanya alîkariyê ya ji bo Kurdîstana başûr hat dest
pê kirin û ew hîn jî dom dike. Festîvala Aştiyê ya 87-
an diyan di van mehên havînê de li Stockholmê hat
li dar xistin. Civîna normal bi komelên endam re û
her weha civînên komîta kargêr û xebata hazirkiri-
na protestoyê ya li dijî rejîma 12-ê îlonê bêf dijwari
gîha encamekê.*

*Li ber me payîzeke ku ji alî xebat ve tijî bi hêvî
disekine. Wek hersal, îsal jî protesto kirina rejîma
12 îlonê dê bi xurtî bête protesto kirinê. Kampanya
alîkariyê ya ji bo Kurdîstana Îraqê dê heya dawiya
payîzê bête domandin.*

*Ji bilî van xebatan dê Federasyon di 4-ê meha 10-
an de musabaqeke sporê ji bo zarok û ciwanên kur-
dan hazir bike. Herwisan, dê di 20-ê meha 12-an de
musabeqeke folklorê kurdî bête li dar xistin.*

Heya hejmareke din, xweşî û saxiya we dixwazin.

BÎNAHIYA ÇAVÊN ME, ŞÊRKO BÊKES


Reşo Zilan

Gelê kurd bi sedan sal e li ber xwe dide da ku hebûn û heyinên xwe yê neteweyî biparêze. Awayê liberxwe-danan çî bûne bila bin, armanca dût û nêzik ya wan her ev yeka han bûye. Ango, wek yek ji gelên cihanê di jîne-ke azad û serbest, bextiyar, serfiraz û birûmet de jîyan. Ne ku wek kole û bende, stûxwar û bêrûmet di navpiyan de çûyîn. Têkoşîn û keftelefa gelê kurd ya îro jî her dûmahika xebat û desthilanînê duhî ye. Ew îro jî beî ku helqeyek ji wê zencîrê biqete û av û av here, didomîne.

Edebiyata kurdî jî yek ji hêmanên herî girîng yê hîmên têkoşîna gelê kurd pêk dihêne. Ew jî bi têkoşîna gel re geş bûye, pêl vedaye. Di xweşiyê de xweş, di nexweşî û tehliyê de jî tehl peyiviye. Di şikestina tevgerê de wê jî derbe xwarine û di rewş û mercên dijwar de wê jî dijwarî dîtine... Bê guman, ew heya îro jî negihaye kama dilê xwe, xwe jî jîna dijwar dernexistiye xweşiyê. Heya gelê kurd negihêje armanca xwe, helbet ew ê jî nikaribe xwe derêxîne xweşiyê.

Di gel evçend nexweşî, tehli û hebûna rewş û mercên hinde tehl, tûj û dijwar, edebiyata me dîsan jî paydar û geşedar e. Pêşdehatinên van dawîyan, nemaze xelatkirina Şêrko Bêkes, vê yekê dipeyîtîne.

Belê, îsal xelata Tucholsky (Tuxolskî) ya Penklubben ya swêdî bû para helbestvanê mezin yê kurd Şêrko Bêkes. Penklubben swêdî ev helbestvanê hêja layiqî vê xelatê dît û ew pê payedar kir. Şêrko Bêkes jî bi vî awayî di nav edebiyata cihanê de cihê xwe yê layiq wergirt û bi vî kira xwe ve rûyê edebiyata kurdî jî spî kir. Bi giştî bi cihanê û bi taybetî jî bi rejîmên kolonyalist, yê ku Kurdistan di navbera xwe de parve kirine û gelê kurd bi hovî dizêrinin, nîşan da ku edebiyata kurdî xwedî paye ye û hem jî payeberz e. Di gel hewldanên hova-



ne yê ji bo nehîştina vê edebiyatê û pişaftina vî zimanî, vî zimanî dikaribû edebiyateke welê berbiçav biafirîne ku ew bikaribe, heta di platformeke navnetewî de jî, zora wan bibe. Herweha dikaribû nîşan bide û bipeyîtîne jî, ku zimanê kurdî çendî bête jêkirin, çendî derbe bixwe û çendî bête qedexe û înkâr kirin, dê ew hinde dirêjtir, dewlemendtir, bi laş û gewdetir û bi kok û rehkuştir bibe.

TUCHOLSKY ÇI KES E?

Navê vî nivîsevanê. almanî Kurt Tucholsky ye û di sala 1890-î de li bajarê Berlînê ji dayik bûye.

Tucholsky yek ji rojnamevan û nivîsevanên herî berbiçav, çalak û jîr yê Komara Weimarê bû. Pasîfîstekî sosyalîst û gelekî bi xurtî li dijî şovenîzm û mîlîtarîzmê bû. Di vî warî de bi navên cihê cihê gelek bendên tûj û



rexnegirî di "Die Weltbühne" (Şanoya Cîhanê) de nivîsîne. Ewî bi nivîsarên xwe yê bi cesaret û bi mêranî ve nav daye. Çend çîrok û kurteromanên "Rheinsberg" (1912) û "Schloss Gripsholm" (1931) gelekî bi nav û deng in. Kurteromana "Schloss Gripsholm" (Koçka Gripsholmê) bi tablo, berghe û dîmenên aramî û ahengdar yê bedbîniyên evîniyê ve nîgarkirî ye.

Piştî şerê didwan yê cîhanê, afirandinên wî, bi taybetî stranên wî yê siyasî ku xwedî tesîreke gelekî xurt bûn, li Almanyayê ronesanseke vejand.

Di sala 1933-an de ji ber ku êdî hew tehamulî bi çargavî ber bi pêşçûna şovenizma almanî dikir, dev ji welatê xwe berda, derwelat bû, hat Swêdê û lê cîwar bû. Lê çî heyf, nikaribû xwe adopteyî jiyana Swêdê bike. Heçî hêmanên berbiçav yê çanda swêdî bûn, ew nehêlan nav xwe û li wî nebawîn. Ev yek bû hoy û sebaba îzole û koşegîrbûna wî. Derbederî, derwelatî û tenêti ew pêrîşan kir. Nema dikaribû li ber xwe bida. Di dawiyê de, wî di sala 1935-an de destên xwe bi xwe êxistin xwîna xwe û xwe kuşt.

Heçî xelata Tucholsky ye, ji du salan û bi vir de ye ku dihête dayin. Dewleta Swêdê, da ku li beramber Tucholsky gunehê xwe derxîne, bi navê wî xelatekê dide. Wek prensîp wê xelatê didin nivîsevanekî, ku mecbûr mabe welatê xwe terk bike, di derbederî û derwelatîyê de bijî. Berî niha ev xelat dane Adam Zagajewski yê polonî û Don Mattera yê ji Afrîkaya başûr. Xelatgir ji aliyê Penklub-bena swêdî ve dihête diyar kirin. Lê heçî perê ne, ku tibaba îsal 75.000 kron bû, ji aliyê dewletê dihête dayin.

XELATGIRÊ ÎSAL

ŞÊRKO BÊKES

Şêrko Bêkes kurê Fayîk Bêkes yê nemir e. Di sala 1940-î de li Silêmaniyê, li Kurdîstana başûr ji dayik bûye. Xwendina xwe yê lîseya teknîkî li wê dawî aniyê. Bavê wî Fayîk Bêkes, ku helbestvanekî mezin î nav-

dar e, hîn di zaroktiyê de jê re bûye îlham. Wî xwe li ber destên bavê xwe têgihandiye, di warê edebiyata kurdî û bi taybetî di warê hunandina hel-

QELEM

*Qelemê serî xoy helgirt
Hiç defter û hiç kaxezê
Neyanzanî...*

*Rây le kiwê kird
Çunke wîstyan daybiden û,
Xoy be xoy bikujêninewe..
Çunke wîstyan wa binûsê
Her bi tenya Sultanekan
Bixwêninewe !*

Helgirt: Rakir, bilind kir
Neyanzanî: Nedizanîn
Wîstyan: xwastin
Wa: Welê, wisan, wilo, wer
Bixwêninewe: Bixwînin

bestên kurdî de serwest kiriye. Di derheqê wê yekê de Şêrko weha dibêje: Ez di maleke edebî û edebiyatê de mezin bûme. Nivîsevaniya bavê min manewiyateke mezin daye min. Ji bo min ew mirovekî bêheval, bêhempa bû. Derya û kaniyê nemiçiq bû. Di zaroktiyê de herkesî ez nîşan didam û digot: "Ev kurê Fayîk Bêkes e" û pesna bavê min dida. Ez wilo bawer dikim ku kurê Fayîk Bêkes bûn, bûye hoy û sebaba ku ez xwe bi edebiyatê ve bilî bikim. Ew mamosteyê min yê pêşîn û yê herî mezin e. Şêrko helbesta xwe ya pêşîn di 17 saliya xwe de belav kiriye. Wî ji wê rojê û bi vir de, gelek afirandinên binirx û giranbiha ji nîka qelesa xwe derxistine. Afirandinên wî xweş nîşan didin, ku ew helbestvanekî modernîst î mezin yê çaxa me ye. Bi ziman û zanîna xwe ve berdevkê kul û kovanên kurdên hejar e. Afirandinên wî ji her alî ve hêjayî lêkolîn û lêhûrnêrinên edebî ne.

Bêguman xelatkirina Şêrko Bêkes ne bi tenê xelatkirina şexşê wî bi xwe ye. Lê belê, ew di rastiyê de xelatkirina gelê kurdî û edebiyata wî ye, ku ji qelesa ciwanmêr û xweşmêrekî weha bi rûmet afirandinên hinde giranbiha û fodil derketine. Şêrko dibêje: Gava ku Penklub-bena swêdî

ez ji wergertina xelata Tucholsky agehdar kirim, min bi xwe hem şa û hem jî neşa dît. Rûmetdayin û hêjardîna min wek helbestvanekî, ez helbet şa kirim. Lê eynî wextê de ez ji ber jîna derbederî, derwelatî û penaberiyê li ber xwe diketim. Ez jî dixwazim wek nivîsevanên din yê wê cîhanê, li welatekî azad, yekbûyî û serbixwe, di aşti, azadî û jîneke piştqayim de bijim û bi nivîsevaniya xwe ve mijûl bibim. Lê bi ya min, giyan û ruhê pak yê Tucholskyê nemir dê wê rojê şa bibe, ku êdî hew nivîsevanekî derbeder û derwelatbûyî bimîne ku xelatê bidinê...

Serekwezîrê Swêdê Ingvar Carlsson, di 14-ê meha tebaxê de, bi destê xwe xelat da Şêrko û beyan kir, ku di rewşê gehînekeke weha zîz û nazik de xelatkirina ciwanmêrekî kurd, ji her aliyê ve biheq û pêwîst bû.

Şêrko Bêkes jî, axaftina xwe ya piştî wergirtina xelata xwe holê dawî anî: — Îro 20 mîlyon kurd dihên ajotin û sirgûn kirin, vebirin û qir kirin. Ev kir û karesat gişt li ber çavên cîhanê kerr û lal tîn kirin...

BENDÎXANE

*Serinc biden
Le estêrekey "Dawid" da
Şeş bendîxaney sêgoşe
Le nawendiya
Mangêkî
Daykî erebî
Tiya reşpoş e
Sirinc biden !*

Bendîxane: Girtîxane, zîndan
Serinc: Dên, bal
Estêre: Stêr
Le nawendiya: Di nivê de
Mang: Meh
Tiya: Tê de
Reşpoş: Kesê ku reş girê dide

Afirandinên Şêrko, ku her yek ji ya din hêjatir, ev in:

Tirîfey Helbest, Kejaway Giryan, Kawey Asinger, Min Tînüyetim Be Gir Eşkê, Kazêwe, Dû Sirûdî Kêwî, Ask, Keşkolî Pêşmerge, Dal, Pîremêrd û Zerya (Hemingway-werger), Riwane. □

Hevpeyvînek bi wezîrê biyaniyan George Andersson re

Goerge Andersson, piştî kuştina serokwezîrê Swêdê Olof Palme bû wezîrê biyaniyan. Di hevpeyvînê de George Andersson di derheqa karê xwe de malû-

matan dide û herweha li ser rewşa kurdan jî dîtînen xwe dibêje. Ev hevpeyvîna serokê Federasyonê heval Hanefî Celeplî çêkir.



Berî her tiştî dixwazim spasên xwe pêşkêşî te bikim, ku te daxwaza me ji bo hevpeyvînekê qebûl kir. Pirsên min dê zêdetir li ser kurdan û rewşa wan be. Lê di destpêkê de ez dixwezim, ku tu çend gotinan li ser karê xwe ji xwendevanên me re bêji.

Ev karekî dijwar e. Lê herweha ev karekî dilgîr e jî. Di nav van mehên dawîn de, min gelek mirovên helez ji welatên têvel nas kirin. Min herweha fîrset dît, ku jiyana grûbên têvel ya kulturî, jiyana wan ya li Swêdê, ku îro jî berê baştir e, nas bikim.

Di nav xebatkarên belediyên Swêdê de, min gelek kesên ku ji bo pena-

beran bi hewaskarî kar dikin, nas kirin. Ev yeka, tişteki gelekî îlhamdar e. Gelek belediyên Swêdê, ku niha bi karê wergirtin û xwedîkirina penaberan ve mijûl in, vî karî, karekî serînkêş û helez dibînin. Ev aliyê postîfîv yê întîbayên ku li ba min hîştine ye.

Lê, di eynî wextê de gelekî zehmet e, ku mirov di dabaşa kesekî de wek bîrpirsiyarekî herî mezin biryarê bide, ku ew jî gelek caran divê biryareke jîwelêtdêrxistinê be.

Ez dizanim im, ku jîwelêtdêrxistina kesekî penaber, ku ne xwediyê sedemên ku qanûnên me pêwîst dibîne ji bo ku li vir bimîne, şertên pena-

beriyê û hwd., ji bo wî kesî dilêşiyekê mezin e, ku divê ji vî civatê veqete û vegere jiyaneke feqîrî û betaliyê. Divê ez li vî mukir bêm, ku ev yek nayê veşartin.

Zehmetiyek jî beşdarbûna di munaqaşeyên weşanên giştî de ye. Ev, di şertên newekhevî de dimeşe. Di derbara dabaşa takekesan de, ku di weşanên giştî de tîm munaqaşa kirin, ez nikarim tevî munaqaşeyê bibim û hemû delîlên ku me bi dest xistine, yan jî em pê bawer in ku me bi dest xistine, pêşkêşî awira giştî bikim. Lewra jî gelek caran biryarên me ji rastiye dûr, wek nemirovî, ne huqû-

qî tên nîşan dan. Mixabin ev karekî weha ye, ku divê ez xwe hînfî wî bikim. Ji ber ku parastina prensîpên sirveşartinê girîngtir e. Ev kesên ku tên welatê me û mafê penaberiyê dixwazin, divê bawerîya wan bi me hebe ku bikarin rewşa xwe ji me re vekirî bibêjin û divê ew jî bizanin ku di derbara şexsê wan de tiştêk li derve naye eşkere kirin.

Di weşanên giştî de tê gotin, ku gelekî zehmet e ku meriv wezîrê biyanîyan be. Dîtina te çi ye?

Belê, rast e. Lê ez muhîm dibînim ku bê gotin, ku ez wezîrê biyanîyan im, ne bi tenê wezîrê penaberan im. Îro li Swêdê di munaqasha me de kêmasiyek e ku pirsên biyanîyan gelekî kêmbal dikişînin. Hema hema ne mumkun e ku meriv pirsê biyanîyan di weşanên giştî de munaqasha bike. Di vî warî de pêşîya pirsê biyanîyan, ji aliyê munaqasha dabaşên jîwelêderxistina takekesan de, hatiye girtin. Di eynî wextî de, ez bi xwe, gava ku bi pirsê biyanîyan re zêdetir dibim nas, dibînim ku ew biyanîyên ku li welatê me dijîn, ewên ku îznan rûniştinê wergirtine, di şertên meriv jê ne razî de, dijîn. Tê diskrimîne kirin, di bazara kar de cihê wan qels e. Di pirsê perwerdekirinê de kêmasî hene, bi gotineke din, di gelek pirsan de di dawîya dorê de ne. Divê di vî warî de em munaqasha bikin û ji van pirsan re derece bi derece hel û çarekê bibînin. Lê ji bo vê yekê jî, gava ku pirs bi vekirî bê munaqasha kirin, divê kesên ku di organên biryaran de rûniştine, di derbara pirsan de haydar bin. Ez bawer dikim, ku di gelek belediyan de endamên meclîsê û endamên îdarê ji vê pirsê bê haydar in.

Di weşanên giştî de hate gotin, ku di dema te de wek wezîrê biyanîyan, bêtir penaber ji Swêdê hatine derxistin. Gelo dîtina te li ser vê yekê çi ye?

Berê dixwazim bibêjim, ku me di praktîka lêhûrbûna dabaşên penaberan de guhartinek pêk ne aniye. Sedîya dabaşên ku me li ser bi erê biryar daye, wek berê ye, ew statîstîkên ku di rojnama Dagens Nyheter de hatine weşandin, çewt in. DN, guhartina prosesa biryardanê, ku Daîra Karûbarên Biyanîyan ya Dewletê niha êdfî du caran li ser dabaşên penaberiyê disekine, nade ber çavan. Eger wek berê bûya, dê hukumatê li ser gelek ji wan dabaşan pozîtîv biryar bida.



Bi dû re, me di zivistana borî de gelekî întensîv kar kir û li ser jimareke mezin ya dabaşên penaberiyê, ku li benda netîceyekê bûn, biryar wergirt. Bêguman, ev yekê jî tê wê maneyê ku me li ser gelek dabaşan biryara dawîn daye. Jimareke mezin ya biryaran tê wê maneyê, ku jimareke mezin biryarên negatîv û jimareke mezin jî biryarên pozîtîv tî wergirtin. Di zivistanê de, me jimarên dabaşên ku biryar li ser nehatibûn wergirtin, ji 3000-î daxiste 1000-î. Me wexta payînê ya ji bo îzinwergirtinê, ji gelekên re kurt kir. Bi giştî û xurtî tê daxwaz kirin, ku di demeke kurt de bersîva penaberan bête dayin. Bi vî karê me, gelek kesan di wexteke kurt de bersiv wergirtin.

Eger em niha vegerin ser pirsê kurdan, gelo dîtina te li ser rewşa gelekî kurd bi giştî çi ye?

Wek grûbeke li Swêdê, tecrubeyên min ji wan hene. Ez xemgîn im, ku bi helkeftina kuştina Olof Palme, di weşanên giştî de, spekulasyon li ser kurdan hate kirin. Polîs şubhe bire ser çend kesên hevalbendên PKK, lê weha hate nîşandan ku bi giştî ji hemû kurdan hate şubhe kirin. Niha, min çend caran bi xurtî diyar kir, ku şubheyên li dijî takekesan divê tu caran zirarê negihîne gelekî. Lê çî mixabin ku ez tîgihîştî me ku dîsan jî kurd wek grûp eşiyane. Ev dilêşiyek e. Di vî warî de divê em xwe bêtir biêşînin, wekî em swêdî dibêjin, nabe ku "hemûyan di şeyekî re derbas

bikin". Her takekesek berpirsiyarê xwe ye. Eger takekesek sucekî bike, yê suçdar, ev takekesa ye, ne xelqek e. Û bi ser de jî, di vî warî de ji hinek takekesan tenê şubhe hatiye kirin.

Rewşa kurdan li welatên têvel ku ew lê dijîn, diyar e û meriv ji ber vê yekê gelekî xemgîn dibe. Bi ya min gelekî muhîm e ku bi munasebetên têvel, qasî ku mumkun e, divê Swêd û neteweyên din yê azad û aştîxwaz, êrişên li ser gelan mahkûm bikin û ji hemû welatan bixwazin ku hurmetê ji mafên mirovaniyê re nîşan bidin. Swêd, di vî warî de, di platformên navnetewî de vê xebatê dike. Bêguman emê vê xebata xwe bidomînin. Lê ev yekê ji bo pêkanîna awira giştî, bi tenê dengêk e, nikare rewşa kurdan biguhêre.

Wekî te jî got, bi helkeftina kuştina Olof Palme, spekulasyonên dijwar li ser kurdan hatin kirin. Grûpa kurdan li Swêdê ji vê yekê gelekî eşiyane. Ji deh hezar kurdên ku li Swêdê dijîn re hûn çî dixwazin bibêjin?

Ez dixwazim careke din bidim kîvêşê, ku divê em li Swêdê fêr bibin ku şik û şubheyên li ser çend takekesan, nikare bibe sedemê ku gelek di bin tohmetê de bimîne. Pir muhîm e, ku ew kurdên ku li Swêdê dijîn, divê bizanibin ku ew jî mîna herkesî xwedî eynî maf û berpirsiyariyê ne. Ew bi xêr hatine civata Swêdê. Em kurdan jî wek grûpên din yê biyanî di hevjiyana Swêdê de wek îmkanîyeteke dibînin. Ez ji dil hêvî dikim ku ev



hefta dostaniyê ku di van rojan de berdewam e, dê bibe sedem ku gelek swêdî û kurd hevûdu nas bikin.

Carna meriv rastî kurdina tê, ku bawer dikin, ku ew spekulasyonên ku hatibûn kirin, têsîr li tewra hukumetê ya li hember penaberên kurd kiriyê. Yanî niha ji berê bêtir kurd ji Swêdê tene derxistin. Gelo dîtina te di vî warî de çi ye?

Ez dikarim garantî bikim, ku di bin berpirsiyariya min de spekulasyonan tu caran tesîr li lêhûrbûna dabaşa penaberan nekiriye.

Kurd, di nivê salên 60-î de destpêkirine û hatine Swêdê. Ewên ku di destpêkê de hatin, karker bûn. Pena-

berên kurd teqribên di destpêka salên 70-î de hatin Swêdê. Îro jimara kurdan li Swêdê li dora deh hezarî ye. Bêtirê wan karker in. Ev yeka nîşan dide ku jimara penaberên kurd li Swêdê kêm e. Ma îmkânên Swêdê tune ne, ku jimareke mezin ji penaberên kurd, ku ji aliyê çar dewletan de tèn teqîp kirin, werbigire?

Ez nizanim, ku gelo meriv dê bikaribe li gor van reqeman bêje, ku Swêd di pirsê penaberiyê de ne xwediyê politîkayê comerd e. Em dabaşa her penaberî wek takekes berçav dikin. Qalibekê me ji bo kurdan, yek ji bo filistinîyan yan jî yek ji bo şiliyan tune. Ew sedemên ku penaber



nîşan didin, ew ji bo me girîng in. Politîka me ya penaberiyê ji bo herkesî wekhev e. Swêd, di praktîkê de di çarçewa peymanê Cenevrê de dixebite. Herweha hinek qanûnên me jî yên penaberiyê hene ku rê didine penaberan ku ji aliyê mirovaniyê de îzna rûniştinê werbigirin. Bi qiyas welatên din, politîka me ya penaberiyê comerd e. Bêguman meriv dikare bêje, ku li gor pêwîstiya mezin ya penaberan, hewce ye ku politîka Swêdê ya penaberiyê comerdtir be. Lê herweha hinek problemên me -bî sînor be jî- hene. Rastî hertim wek meriv dixwaze, nabe. Problema herî mezin, hatina jimareke mezin penaberan e. Jimara penaberên ku tene Swêdê, ji jimara cihên penaberan ya di belediyan de bêtir in. Penaberên ku di kampên penaberan de dimînin, her ku diçe, zêdetir dibin. Lewra gelekî muhîm e, ku em di civatê de awireke giştî ya xurt pêk bînin da ku em bikarin wergerîtin û xwedîkirina penaberan berdewam bikin. Bi vî awayî emê bikarin politîkayê penaberiyê ya dûrbîn û comerd pêk bînin. Nabe ku em bicarekê deriyên xwe heta dawiyê vekin, paşê jî mînanî gelek welatên din, deriyên xwe bi temamî bigirin. Tiştê ku bêtir min xemgîn dike, ev tedbîrên hişk in ku ji aliyê welatên Ewropayê de tèn wergerîtin.

Demekê berê, ez di konferansekê li ser biyaniyan de beşdar bûm. Di konferansê de pirsê penaberan jî hate rojpergalê. Lê mixabin, welatên Ewropayê di vî pirsê de gelekî bêxem bûn. Meriv nedikarî behsa politîkayê comerdî ya penaberiyê bike.

Carna meriv dibîhize ku penaberekî kurd ji Kurdîstana Îraqê li Sûriyê tê vegerandin yan jî penaberekî kurd ji Kurdîstana Îranê li Turkiyê tê vegerandin. Politîka van welatan li hember kurdan diyar e: Zor û zulm. Gelo Swêd çawan dikare mirovekî kurd vegeerîne welatekî ku dijminahiya kurdan dike?

Tiştê ku tu niha îdîa dikî, dibe ku ji bo penaberên takekes be, ku kontrola min li ser tune ye. Di warê jisînorvegerandina penaberan de, qaîde ev e: Eger sedemên ku penaber nîşan dide, ji bo mayîna li Swêdê bes nekin yan jî eger welatê sêhemîn penaberê ku tê şandin, venegerîne welatê wî, ew dikare ji sînor bête vegerandin. Di vî warî de Daira Karûbarên Biyaniyan

ya Dewletê li ser dabaşa takekesan biryar werdigire. Divê Daîra Karûbarên Biyanîyan ya Dewletê ji her dabaşeke weha bête agehdar kirin. Eger ew bibînin ku biryara polîs çewt e, jiwelêtderxistina penaber dide sekînanandin û paşê bi xwe biryarê li ser dide.

Bi dû re, penaberek dikare biryara jîsînorvegerandinê, li cem hukümetê îtîraz bike. Ev yeka çend cara qewimî û hukümetê biryara Daîra Karûbarên Biyanîyan ya Dewletê û polîs çewt dît. Ev îmkana hukümetê heye, ku di dabaşa takekesan de mudaxele bike.

Ji ber ku em kurd ne xwedî dewletekê ne, karê li pêşiya me gelekî zehmet e. Wekî pêşdebirina zimanê me yê qedexe, kultura me, edebiyata me û hwd. Karên weha îmkânên mezin û piştgiriyên xurt divên. Gelo meriv nikare bifikire ku Swêd, yek ji parêzgerên mafên mirovî, di vî warî de înisiyatîv bigire da ku merkezek ji bo pêşdebirina kultura kurdî û zimanê kurdî saz bibe?

Ev pîrseke zehmet e. Ev pîrsa girêdayî îmkaniyetê ye. Ez dizanim ku niha çend grûpên biyanî hene ku ji bo pêşdebirina kultura xwe merkezeke kulturî yan jî înstîtûtan daxwaz dikin. Îro ez nikarim bersiva van daxwazan bidim.

Heye ku sibehî?

Belê, dibe ku sibehî.

Niha ez dixwazim careke din spasî te bikim û eger tu dixwazî tişteki din ji kurdan re bêjî, fermo!

Wekî min got, danûstandinên ku min heya niha bi grûpên biyanîyan re pêk anîne, ji min re bûne tecrubeyên gelekî giranbiha. Ev yeka han ji bo danûstandinên min yê bi Federasyona kurdan re jî derbas dibe. Ji bo min kêfxweşiyê mezin bû ku ez di kongreke gelekî balkêş bû. Ez hêvî dikim ku ezê bikaribim van danûstandinên germ berdewam bikim û ji rewşa kurdan ya di civata Swêdê de haydar bibim. Û herweha ez hêvî dikim ku ev neheqîya ku li kurdan hate kirin, bê rast kirin ku hûn jî li Swêdê bi her awayî tevî hevjiyanê bibin.

Ez dixwazim bi kêfxweşî diyar bikim, ku penaberê yekemîn ku me li Lykseleyê qebûl kir û ew bi malbatî kire mewanê xwe, kurdek ji Kurdistana Îraqê bû. □

Mihemed Arifê Cizirî

50 Sal di xizmeta strana kurdî de

Faxredîn Gerdî

Stranên kurdî gelek kevn e. Mil bi mil ligel milletê kurd bi rêveçûna xwe dest pê kiriye. Vêca divê baştir bête zanîn ku strana kurdî şîr e, çîrok e, rêzgirtin (ihtîram girtin) e, bîr û bawerî ye, evîn e, bi kurtî rondik rijandin û bi serfirazî felsefa jiyana milletê me ye.

Bi bawerîya min strana kurdî, bi xurtî û rawanbêjiya xwe zimanê kurdî parastîye. Strana kurdî ferhenga zimanê me ye. Gelek ji wan peyvên ku ji ber stem û êrîşên dijminan wenda bûne, tenê di stranên kevin de tên dîtin. Bi rastî divê em bêjin, stranê kevn seyda ye. Stranê kevin ji xwendegên berz û pîrbabetin. Babetên evîni, şoreşgerî, aborî, hunerî hwd.

Hezkirina min ji dengê M. Arif Cizirî ji mêj e. Bi bawerîya min hemû kurd hez ji dengê M. Arif û tembûra wî dikin. Lê eger herkes ji min bipirse û bêje; Çima tu hez ji deng û strana M. Arifê Cizirî dikî? Wê çaxê ezê bêjim; çimkî stranbêjekî hêja û mezin bû. M. Arif bi dengê xwe yê zêrîn, stranên kurdî parast. Bi saya devê wî

yê zêrîn, ev stranên kurdî yê saxlem ji nemanê rizgar bûne. Her ji ber hindê bû, ku du kaset ji dengê wî di sala 1979-an de hatin hilbijartin û wekî nimûnên strana kurdî ji bo UNESCO'yê hatin pêşkêş kirin. Bê guman cîgahê M. Arif gelek bilind e. Çimkî tarîxa stranên kurdî bi şanazî li M. Arifê Cizirî diket. Dengê wî deng daye li hemî dorhêlên Kurdîstana me ya rengîn. Stêrik geş bû, ronahiya xwe belav dikir li hemû rex û deran. Serkaniyek zelal bû. Stranbêjê me yê hêja bizavek mezin kir ji bo parastina folklorê me ya zêrîn. Dengê xwe belav kir di nav milletê me yê kurd de. 50 sal M. Arifê Cizirî bi dengê xwe, bi tembûra xwe, bi mezîniya xwe yî zelal, strana kurdî ya resen anî pêşçav. M. Arifê Cizirî gelek ji mêj ve bi hemî jiyana xwe xizmeta awaz û strana kurdî kiriye. Her ji ber hindê bûye eşk û viyana di dilê hemû kurdan; zarok û pîr û ciwan û xort.

Hunermendê me M. Arifê Cizirî, ji xelqê Cizirî Botan e. Di sala 1912-an



Li jêr nimûneyek ji stranên M. Arifê Cizîrî.

Yar Helîmê

Were were Helîmê, were
Îro sîngê te zozan e, minê birî ji xwe re
Ax were, were keçik Helîmê
Tu ji xelq î, tehle li min şîrînê.
Zozanê cî Mimemed Alî begê xoş bîne,
Ez û Helîme xwe biçîne
Were were Helîmê canê
Ez ê çême Helîma minê taxa jûrî,
Helîmê tênûr dada.
Ezê hat taxê navê Helîmê minê mehrûm bada.
Hawar e, gelî gundiyan û cîrana
Ezê hatim taxa xwarî
Bi herdu çavêt serê xwe dibînî
Helîma û axay reyhan av da
Sing û berê bedenê Helîma mal
Xirab bîne... bayê demira da
Were were Helîmê canê
li xelqî tahlê li ber dilê min çend ciwanê.

de li Torê, li devera Cizîra Botanê hatiye dinyayê. Di sala 1927-an de hate girtin û avêtin hepisxana Diyarbekirê. Ew, nêzîkê çar sal û sê meh di bendîxanê de ma. Bi dû re, ew hate berdan û hemû heval û hogirên wî hatin dardekirin. Ew ji bo çî hatin berdan. Çimkî emrê wî ji bo dardekirinê piçûk bû. Her ji ber problemên siyasî piştî ji hepsê derket, qesta Zaxo û Dihokê kir û li wir dest bi kar kir. Di sala 1932-an de bi keçeka Çolemergê re zewicî. Du zarokên wî çêbûn.

Di sala 1933-an dest bi stranê kir, li Dihokê. Bo cara pêşî bi Meyrem Xanê ve çar sêlik tomar kirin. Ji sala 1934-an ta sala 1935-an li gel Meyrem Xanê stran gotin. Li Beyrûtê, Şamê, û herweha li Kurdistanê Iranê, li gel Meyrem Xanê, Hesênê Cizîrî û Almas Xanê konser li dar xistin. Di sala 1949-an de qesta radyoya Kurdî li Baxdayê kir. Herçend berê hingî gelek stran bo sêlikî kompanya biyanîyan tomar kiribû. Nêzîkê 36 sêlik di çar salan de tomar kir. Ji ber hindî hate qedir girtin û gelek caran xelat danê.

333 stranên M. Arifê Cizîrî li radyoya kurdî û 18 stranên wî di televizyona kurdî de, li Kurdistanê Başûr hene. Lê gelek kaset û vîdêoyên wî jî hene.

Stranbêj û hunermendê li dewrê M. Arifê Cizîrî, heyranbêjî kurd Resûl Gerdî dibêje: "M. Arif stranbêjekî gewre ye. Bi gotina lawikê kes nagihête". Stranbêj Gulbahar dibêje: "Çi deng berî M. Arifê Cizîrî nehatiye û niha jî nîne. Ez bawer nakim rojekî dengê bêt wek dengê seydayê me M. Arifê Cizîrî". Stranbêj Îbrahîm Hesên dibêje: "Ma çî heye, hez neket û nebêjî M. Arifê Cizîrî ez kirime stranbêj". Hunermend Dilşad Mihemed Seîd dibêje: "Dengê M. Arifê Cizîrî ji aliyê zanyariya musîqayê de dengê mezîna e. Çî heye ku bêguman, dengê bihêz îro kêm heye li cîhanê, bi vî emrî bijît û van stranên bêtî". Stranbêjê bi navê dengê Tahsîn Taha dibêje: "Hemû Stranbêjên kurd deyndarê M. Arifê Cizîrî ne. Çimkî M. Arifê Cizîrî mamosteyê hemûya ye û kutubxaneyê serbixwe ye di cîhana hunerî kurd de. M. Arifê Cizîrî seydayê min e û heke ew

neba Tahsîn Taha ne dibû".

Dilên evîndar û aşîqên strana kurdîya resen çilmisî. Heyveka geş li asîmana Kurdistanê rizya û werya di nav şeva tariyên me. Dilê stranbêjê mezîna bêdeng bû, di seet heştûnivê spêdiya roja çarşemiyê 17.12.1986-an de. Axa Kurdistanê pîroz di nav henavêt xwe da hewand. M. Arifê Cizîrî yek ji wan mirovên mezîna bû di nav dilên xelkê de. Yek ji wan navdarên folklor û saman û rewîşt, çîrok, dîrok, serhatî û destanên milletê me parastin bi dengê xwe, careke din sax kirin û qutar kir ji bizir bûn û ji nemanê.

Hezar silav li bîranîna M. Arifê Cizîrî, ew mirovê ku 50 sal di xizmeta staran û kultûra kurdî de bû. □

Çavkanî

- 1-Kaseta tarîxa jiyana M. Arifê Cizîrî, bi xwe bahsê jiyana xwe dike.
- 2-Kasetên M. Arifê Cizîrî.
- 3-Edebî folklorî kurdî, Professor Izeddîn Mistefa Resûl, 1970.
- 4-Rojnama Hewkarî, Adar 1987.
- 5-M. Arifê Cizîrî, Kewê Rebada nûsî-nî Segvan Hekîm, çap sala 1986.

Kurdistan ne tenê yek parçe ye

Em tev vê rastiyê dizanin ku Kurdistan ne tenê yek parçe ye. Qet kesek ji me bawerî pê nîne, ku bîr û hizir-kirina navçeyî tiştê rast e. Bawerîya me gişan ew e ku divê em ji bo Kurdistanê hizir bikin û kar bikin.

Gelo em di rewşa xwe ya îro de dikarin bêjin ku em hizra Kurdistanê dikin?

Bersiva vê pirsê naxêr e.

Hê em têngîhiştine ku em ê çawan hizra Kurdistanê bikin. Emê çawan bikaribin hizra Kurdistanê bikin heger em miletê Kurd bi giştî nas nekin. Heger em miletê Kurd bi giştî nas nekin, em nikarin navçegeriyê ji bikin. Em nikarin navçeyekê jî binasin û di navçeyekê de jî em dê negihêjine netîcê. Ji ber ku temaşkirina cîhekî ji du şûnên cîhê, ser wî tiştî du wênan dide me. Ji ber ku hizra li ser tiştê, bi du tiştên cîhê, du têngîhiştin li ser wî tiştî dide mirov. Şairek û doktorek bi du awayan ji mirovekî têngîhiştin. Zaneyek wek nezaneke li tiştan nanihêre. Mirovekî kurdîstnî û mirovekî navçeyî jî wek hev ji navçeyekê têngîhiştin. Mirovê Kurdistanî bi hişyarî û ronakbîriyê firehtir temaşeyî navçekê dike.

Navçeyî ango navçebîrkirek ji bo ku navça xwe binase, hewcedarê zanî û hişmendiyê berzîr û bilindtir e.

Mirovekî Kurdistanî ji du teweran (mihwer) li navçeyekê dinihêre; tewera derve û ya hundir.

Navçeyiyek hundirê malan dinase, lê nizane ku mala wî li ku dikeve.

Gelo doktorê çawan dikare bi tenê çawan nas bike?

Gelo doktorê xwînê dikare bi tenê xwînê binase?

Bersiv: Na!

Ji ber wilo mesela Kurdistanîbûnê li vir ne mesela hîlbijartina modeleke nû ye. Belkû Kurdistanîbûn bi serê xwe pêwistiyê navçeyî ye, jî. ye. Em nikarin di navçekê de jî bi ser-kevin heger em bi derece û radeyê berzîr nerin û nenihêrin. Em di navçekê jî de nikarin bi serkevin heger em Kurdistanî nefikirin. Nimûne û mîsalên dîrokî nêzik in. Hê toza ketin û şikestina şoreşa 75-an ranebûye.

Navçegerîya Kurdistanê Iraqê perçê Kurdistanê Iranê xiste bin piyan û bi xwe jî şikest. Heger Kurdistan yek Kurdistan e û mesela Kurd jî yek mesele ye, çawan dibê ku destek di rîya destê din de bête feda kirin?

Gelo her lêdana parçekî ji perçên Kurdistanê ne lêdana giş mesele ye. Em giş qala Kurdistanê mezin dikin, lê ji bo wê me çi kiriye?

Em nikarin Kurdistanî bilivin heger Kurdistanî nefikir in. Em nikarin Kurdistanî bihizirin heger em Kurdistanê nenasin. Herwiha em dê nibikaribin li ber mesele Kurdistanê kevin heger em amadebûneke subjektîf neyînin pê û mistewa ronakbîriya xwe bilind nekin. Madem wa ye ji bo ku em bikaribin mesele Kurdistanê têngîhiştin pêwîst e, em hewl bidin da ku amadebûna xwe ya subjektîf pêk-bînin û di aliyê ronakbîrî de xwe bi pêş xin. Ji bo ku em bikaribin Kurdistanî bihizirin, divê em mesele Kurdistanê têngîhiştin, ji bo ku em bikaribin Kurdistanî bihizirin, divê em hem Kurdistanê bi xwe û hem jî mesele Kurdistanê binasin. Ango ji bo ku em bikaribin Kurdistanê hizir bikin, divê em hewl bidin ku Kurdistanî bihizirin.

Niha em li derveyî meselê rawestî ne, Gava yekemîn ew e, ku divê em amadebûn û mistewa xwe ya ronakbîriyê pêşde bixin. Divê em ji xwe bipirsin gelo em dê çawan bikaribin bi vî barî rabin? Em ji bo ku di tiştê de bigihên divê tiştê din binasin. Bi çi û di çi de bigihên? Ji bo ku mirovek zanibe ku ew qet nizane, pêwîst e ew hin tiştan zanibe, bi wan tiştan dizane ku nezan e. Loma ewên ku tiştê nizanin, wa dizanin ku ew her tiştî dizanin. Ji ber ku ewqasî nezanin ku nizanin tiştê nizanin.

Em nikarin xwe û çanda xwe binasin, heger em hewl nedin xwe jî dêsde bixin. Hewldan ji bo nasîna xwe bi xwe ji hewldana ji bo bilindkirin û pêşdestina mistewa ronakbîriya xwe cîhê nabe.

Me hê tiştê ne kiri ye. Di temenê rêxistînekê de salek ji bo meseleke ewqasî mezin bi qeys rojekê ye. Em miletekî parçekirî ne. Lê pirs û pirs-

girêka me ne tenê mesele rejîmên dagîrker in. Em bi xwe di xwe de jî pirs û pirsgerêkek in. Ew jî paşdemayî ne. Heger îro sînor nahêle xelkên Silêmanî, Mehabad û Diyarbekirê hevûdu bibinin jî, lê sînorên hikûmetê rêgeha Silêmanî û Dihokê negirtiye. Sînorê paşdemayî û dakeftinê ji sînorê dewletan bi hêztir e. Heger sînorê dewletan li derve rê li me digirin, ew sînorê paşdemayî li hundir tîr ser riyên me. Em ne di wextê wilo da ne, ku xelk bi hêştiran diçin hecê. Ew ê ku nîne em bi xwe ne. Gerek em hewdariya xwe bi xwe nekin, Em divê her roj ji xwe bipirsîn: Em çi fêrbûn û îro me ji xwe re çi kir??

Em wa dizanin ku em zehf nêzikî Kurdistanê ne, lê tiştê yekemîn ku zimanê me ye, em pir jê dûr ketine. Ne tenê Kurdên Mereş û Xaneqînê ne yên ku bi kurdî nizan in. Em jî heger wa bizanin ku zimanê kurdî her soranî yan jî kurmançî ye, we çaxê em kurdî nizanin. Em divê bizanibin ku heta niha me tiştê nekiriye ku her ji ber wilo em ji hevûdu têngîhiştin.

Sazbûna komeleke wa karekî pir girîng e. Ev komele cîhekî wa ye ku mirov dikare pir tiştan tê de bike. Em di nav vê komelê de hewl didin ku deng û bas, edeb û tevgera civakî ya her perçekî Kurdistanê binin holê. Ji bo vê armancê divê em ji bo hebûna bîr û rayên renga-reng û cîhê jî amade bin.

Di komeleke wa de û ji bo armaceke wa mezin xebatînin, hizirîna û mêjî divê Heger em ji aliyê erdê de çar perçe bin, ji aliyê bîr û cîhê civakî de em sed perçe ne. Em mîna avekê ne ku bûbe çend perçe qeşa. Em divê ji bo hilandin û tiwandina van perçên qeşê têngîhiştin û bibin yek. Em, bi me xweş be yan tîrş be, çend perçe qeşa ne, heger di kîmyayê jî de yek tişt bin ji aliyê fizîkî komelek in.

Xelkê Mereşê zêdetir di gel xelkê Mereşê dibane. Kurdên Iraqê zêdetir di gel kurdên Iraqê radibin û rûdinin. Herwiha kurdên perçên din jî wilo. Navçeyî ne tenê di siyaseta û tevgera çekdarî de xwe nîşan dide, di pisiko-

lojî û xwiya mirovan de jî xwe diyar dike. Heger em xwe teslîmî mîzacadî navçeyî bikin, em dê tiştêkî nikarîbin bi ser xî. Wê wextê em ê ji nav lepê mîzaca navçeyî û eşîrtiyê bêner, ku em haydar û hişyar û armançên kurdistanî derxin pêş û li yê navçeyî siwar bikin.

Madem wa ye, di nav komeleke wek komela me de têkoşîn û xebat li ser hizir û mêtî radiweste... Madem wa ye mirov divê xwe bi teorî û prensîpan ve girêde. Bo ku miro bikaribe karekî wa jî rabe, pêwîst e mirov ne îdealîst be, eşîrî nefikire, xwe bi tenê nebîne û bîr û raya xwe bi zorê li ser xelkê ferz neke. Pêwîst e em bi rêz û hurmet bîr rayên cihê binihêrin, hizir û bîrên kesên ku mîna me nahizirin, di nav pisîkoza çep û rastiyê de nekujin û bikin ku wê ji mekanîzma federasyonê re bi giştî bikin qewet. Em divê ji cîhana hevûdu ya fikrî û pisîkolojîkî re bi tolerans bin. Bi şêwe helwêstên pirimîtîv û fikirkirina eşîrtiyê em nikarin tiştêkî fêrî bikin û karekî ciddî bikin. Gelek ji me wa dizanin demokrasî ew tişt e, ku ew bi xwe biryarê li ser dide. Demokrasî ew e ku ew hej jê dike. Paşdemayîm tim û dayîm di nav me de axakî din, axakî nû diafirîne. Em divê fêr bibin ku kes ji me ji bo xatirê yê din naxebite. Loma her kes divê di fikirkirin û biryardanê de azad be. Em dixwazin pirobleman çareser bikin û rêgehekê ji çareserkirina wan re bidozin. Wexta ku bîraderek di kongrê de hêrs dibe û dibêje: "Em pêwîst e bi kurdî qise bikin". Ne lazîm e ew ê bi kurdî nizanin tûre bibin û derkevin derve. Ne pêwîst e ser bikin. Helwêst girtina bi vî tarzî dûrî fikirkirinê ye û ji refartî û teserufê awha dijmin feyde dibîne. Heger em bi fikir kar bikin, em nikarin gotinên wî bîradere talan bikin. Ji ber ku yê ku dixwaze zimanê kurdî wîna bibê, dijmin e û ew bi giştî îmkânên xwe ve jî têdikoşe da ku zimanê me nemîne.

Eger ez sîtilek av birijînim ser we, dibe ku kes şil nebe?

Gelo kes dikare yê ku kurdî nizanin kurd hesab neke??

Bersîv NA ye. Ji ber ku kes bi biryarekê nabe kurd û ji kurdîtiyê jî der-nakeve. Ew ê kurdî nizanin û xwe wek kurd dizanin û dixwazin wek kurd bijîn li ser rêyeke dijwar û sext

in û karê wan ne sivik e. Lê ev nayê wê manê ku em dijwariyên li ser rîya wan girantir û mezintir dikin. Em divê alîkariya wan bikin da ku li zimanê xwe bişidin.

Mesele ne di nav ewên bi kurdî qise dikin û yê ku nikarin qise bikin de ye, ne meseleke dijîtiyê ye, belkî meseleke şaştegiştîyê ye. Em di vê komelê de dixwazin ji timamê dilan dilekî mezin bînin pê. Em dixwazin problemên her parçekê, bi hêz û alîkariya perçên din çareser bikin. Di vê wexta han de pir tişt derketin. Kongra me kongreke demokratîk bû. Lê, kongreke hejar û ne dewlemend bû. Hejariya kongre jî ji wê xuyaye, ku heta niha me tiştêkî nekiriye. Ji ber ku problemên mezin ne li ber çavan bûn, problemên biçûk cihê wan girtibûn.

Rivdekê kongre terk kir û derket. Me ji bo çûna malan û axaftina bi wan kesên ku kongre bi cih hiştin re komîteke taybetî pêk anî. Paş serdana çend malan, hin xal diyar bûn, ku bi a wan, ew sebebên derketina ji kongrê bûn;

1-Bi giştî digotin kongre ne kongreke demokratîk bû.

2-Digotin hin kesên ku ne endam bûn di kongrê de dengên xwe dan.

3-Bi a wan, hin kesên ku temenê wan 14 salên xwe danegirtî beşdarî dengdanê bûne.

4-Digotin hin kesên ku endam bûn, di lista endaman de navên wan tune bû.

5-Herweha ji xelkê Mereşî re hatiye gotin ku ne Kurd in. Mirov dikare her gotinê bêje, lê nikare her gotinê îspat bike. Mesele ne ew e, ku bêjin ew ne demokratîk e. Tiştê seyr û xerîb ew e, ku ew ê dibêjin kongre ne demokratîk bû, ne amade ne bêne lokala komelê jî. Nehatin civîna giştî û ji serektiya Federasyonê jî bi nivîsandin kongrêkê bê qeyd û şert dixwazin. Diyar e ku li ba wan hevalan dimokratîkbûn ew e, ku ew biryarê li ser bidin. Di derbara xala didwan heta bi ya çaran gotinên wan bê delîl û bê belge bûn. Gotinên wan ne rû di rû de, lê paşmîl bûn. Tenê carekê di kongrê de, ew jî paş wê ku li dawî hinek xirecir bû, gotin; "filankes ne endame û karta endametiye pê re ye". Dîwanê jî temaşa blanketa endametiye kir û kaxeta endametiya wî nişan da.

Em bi çi ji çi têbigihên?

Ji bo em di tiştêkî de, ku di nav du terefan de qewimî bikaribin têbigihên, divê em muracaatî herdu aliyên bikin. Ew ê gotinan heldibestin (dedîkodu dikin) dizanin ku rast nabêjin. Lê ewê gotinan dibihîzin û bawer dikin, pêwîst e bîr û dawa tamaşekirina lista endaman bikin û mesele munaqeshe bikin. Ev ne tenê ji ber xatirê berjewendiya komelê pêwîst e, lê herweha ji bo ku mirov neyê xapandin û nebe listik jî pêwîst e.

Heşî mesele Mereşî ye: Kî xelkî Mereşê wek kurd nas nake, çawan tê zanîn, ku dijîtiya xelkê Mereşê dibe?

Gelo di destûra komelê de tiştêkî heye, ku rê li xelkê Mereşê bigire da ku ew karê xwe nekin?

Gelo penîr yan jî tîfing hatiye belavkirin ku xelkê Mereşê jê ma ye?? Em divê bizanin, ku mirovên ku komele ne bi dilê wan e û naxwazin komele hebe, hene. Em divê bizanin ku mirovên ku ji ber çend sebebên ji komelê re problem derdixin, hene. Ji bo vê yekê jî pêwîstî bi tiştan heye, heger tiştêkî peyda nekirin, bi xwe durist dikin. Problem ne ew e, ku derewan dikin, lê bi derewan baweriyê tînin. Ewên bawer dikin, gerek bi mêtîyê xwe li ser mesele bihizirin.

Ev komele ji bo armançeke mezin ava bûye. Çi di kongrê de û çi jî paş kongrê, hin kesan giraniya wezîna xwe berdaye ser tiştên biçûk û di nav tiştên biçûk de heta bi qirikê xeniqîne.

Wext heye, ku bête pirsîn û gotin: Gelo van hevalan zêrê nedaye komelê, gelo zêde pêdaketina bi vê mesele ne pêhnêk e li prensîp, armanç û hurmeta xelkên din, gelo bidûketina van kesan ne li ser hesabê kesên din e?

Gelo li hember bawerî û mîzacadî navçegerî û eşîrtiyê nermayî û ewqas bêhnfirehî ne pêhnêk e, li demokrasîyê?

Hin heval li gora kêfa xwe hespê mîzaca xwe didin çargavan, bêtî ku hesabê xelkên mayî bikin.

Gelo ne wext e ku em vê mesele dawî bînin. Gelo berdeambûn û îsrar li ser vê mesele ne bêhurmetî ye beramber xelkê û armançên komelê? □

Têbînî: Ev gotar di civîna giştî de ya Komela Kurdistanê de li Uppsalyê ji aliyê Komîta Birêvebir ve hatiye pêşkêş kirin.

ELÊN ENDAM JI KOMELÊN ENDAM JI KOM

Festîvala aşî ya Îskandînavyayî



Wezîrê karûbarê dervayî welêt, Sten Andersson, serdana cîhê Federasyonê kir.

**FREDS-
FESTIVAL-87**

Långholmen
Stockholm 24—28 juni

Di 24-28 ê meha Hezîranê de festîvaleke navnetewî ya aşîyê li bajarê Stockholmê pêk hat.

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê û endamê wê Komela Kurd Li Stokholmê jî, wek gelek rêxistinên swêdî û biyanî, di vê festîvalê de beşdar bûn. Nêzîkî 200 rêxistinên curbecur di haziriya vê festîvlê de kar hildabûn ser milên xwe. Herwisan zêdetirî 200 rêxistinên swêdî û biyaniyan jî ji bo propagande û xebatên rêxistinên xwe cîh girtibûn. Federasyona me jî di beşa navnetewî de cîhek vekiribû.

Di cîhê Federasyonê de xwarinên kurdî ji bo mêvanan hat pêşkêş kirin. Herweha ji bo dannaşin û propagandakirina pîrsa kurdî jî gelek xebatên pîralî û hêja hatin kirin.

JI KOMELÊN ENDAM JI KOMELÊN ENDAM



Festîvalê hem li ser rewşa niha ya Kurdistanê û hem jî li ser rewşa penaberên biyaniyan du debat li dar xistin. Di herdu panelan de jî li ser navê Federasyonê sekreterê Federasyonê heval K Îzol bîr û baweriyên Federasyonê ji bo guhdar û mêvanan dan diyar kirin. Di van panelan de gelek kesên swêdî û biyanî beşdar bûn û pirsiyarên xwe yên li ser pirsê kurdî ji nûnerê Federasyonê pirsîn.

Herwisan, li sê cîhên curbecur dîlanên kurdî ji mêvanên Festîvalê re hatin pêşkêş kirin. Grûpa folklorê ya Koma Komela Jinên Demokrat yê Kurdistanê û Koma Şengal bi dîlanên ji derûdora Diyarbekir û Hekariyê

bala bi hezaran mêvanên ku hatibûn Festîvalê kişandin.

Di dawiya programa folklorê de tevî mêvanên beşdar govendên kurdî hatin girtin û bi hezaran kes bi awakî baldar temaşî govandan kirin.

Di festîvalê de ji bo kampanya alîkariya Kurdistanê başûr jî, ku nû dest pê kiribû, xebatîne berbiçav hatin kirin. Bi dirêjahiya vê Festîvalê, di warê pereberhevkerin û propagandekirinê de çu dirîxî nehat kirin.

Ji serî heta dawiya festîvalê, endamên Komela Kurd Li Stokholmê bi xurtî di hemû karûbarên festîvalê de beşdar bûn.

Semînerêk

li ser çîrokên kurdî

Nivîskarê kurd Bavê Nazê, di roja 27-ê hezîranê de semînerêk li ser çîrokên kurdî da. Nêzîkî 40 kes di civînê de beşdar bûn. Ev semîner jî aliyê Komela Kurd li Stockholmê hatibû hazir kirin.

Şahiyeke ji bo biyaniyan

Di Dibistana Gelerî ya Västerhaningê de, di 23-ê gulanê de, şahiyeke ji bo xwendekarên biyanî hate li dar xistin. Di şahiyeke de ji 15 netewên nêzîkî 200 kes beşdar bûn. Em jî bi navê Komela Kurd Li Stokholmê di şahiyeke de beşdar bûn. Nûnerê komela me li ser rewşa li Kurdistanê axaftinek kir û bi dû re bersiva pirsên mêvanan da. Bi axaftinê re wêneyên dia jî hatin nîşan dan.

Di şahiyeke de di gel muzîka kurdî, Koma Govendê jî dîlanên kurdî pêşkêşî mêvanan kirin. Dema Koma Govendê dîlanên kurdî listin, mêvanan nikaribûn xwe bigirin, ew jî rabûn tevî dîlanên kurdî bûn.

Festîvala Furuvîkê

Her havîn li bajarê Furuvîkê, "Festîvala Stranan" tê lidarxistin. Stranvanên bi navûdeng, ji hemû cîhanê tîne tevî vê festîvalê dibin. Herweha neteweyên têvel bi stran û dîlanên xwe ve beşdarî festîvalê dibin.

Kurdên li Swêdê cara pêşîn, par di Festîvala Furuvîkê de beşdarî kirin. Îsal jî, wek par bi xebat û haziriya hêja ya Komela Kurd Li Bollnäsê, kurdan beşdariya festîvalê kirin. Cîhê festîvalê de, komelê pêşandaneke ji destkirên kurdî nîşan da. Xwarina kurdî jî di nav beşdarên festîvalê de hate belav kirin. Bi alîkariya Federasyonê jî Koma Govend, di festîvalê de beşdar bû û dîlanên kurdî pişanî mêvanan dan. Herweha koma zarokên kurd ji Bollnäsê jî dîlanên kurdî pişan dan û gelekî bala mêvanan kişandin.



Ji Komelên Endam Ji Komelên Endam

Kampanya alîkariyê ji bo Kurdistana Başûr

Di destpêka meha hezîranê de, Federasyona Komelên Kurdistanê li Swedê, ji bo Kurdistana başûr dest bi "Kampanya alîkariyê" kir.

Wek tê zanîn, ji 15-ê nîsanê û bi vir de, rijîma faşîst ya Îraqê li hember gelê Kurd li Kurdistana başûr dest bi bikaranîna çekên kimyayî kiriye. Bi dû vê pêşdehatinê sedan mirovên kurd hatine kuştin û birîndar kirin.

Lê mixabin, herçend ev bûyer bi her awayî li dijî peymanên navnetewî be jî, li derveyî welat li hemberî vê subûta mezin, deng zêde derneket. Rêxistinên navnetewî, wek Neteweyên Yekbûyî û Xaça Sor, yan jî dewletên ku bi îmzayên xwe di wan peymanan de pardar in, hîç li hember vê bûyerê derneketin.

Lê, helbet, kêmasî ne yên wan bi tenê ye. Em bi xwe, wek netewe, wek nûner û rêxistinên vê dozê divê bi her awayî dengê xwe bilind bikin, piştgiriya awira (bîrûraya) giştî ya cîhanê ji bo doza gelê xwe amade bikin. Em divê di vî warî de xebatîne baş û hêja li dar bixin da ku tesîreke mezin li ser awira (bîrûraya) giştî ya derveyî welat bikin. Ji xwe ev yeka han, yek ji erk û wezîfeyên me yên girîng e jî.

Komîta Kargêr ya Federasyona Komelên Kurdistanê li Swedê, gava biryara KAMPANYA ALÎKARIYÊ JI BO KURDISTANA BAŞÛR girt, ji van rastiyan hereket kir. Ji alîkî ve ev xebateke tabî ye, ku diva bû Federasyon wê bîne cîh. Ji aliyekî din ve jî, divê Federasyon bi vî awayî bikaribe endamên xwe di xebatekî wisan girîng de aktîf seferber bike. Bi germî bikaribe rastiya rewşa gelê me hem di nav kurdan û hem jî di awira giştî ya cîhanê de biparêze.

Dibe ku Federasyon nikaribe bi vê kampanyê alîkariyê mezin berhev bike. Lê qezenca me, wek netewe, ew e ku em bikaribin xwe her gav ji bo alîkariya gelê xwe amade bikin. Bi germî herin ser bûyeran. Gava ku me bi vê armançê dest bi kampanyê kir,



me giringiya rewşa aktuel hesabandibû. Me dizanîbû ku em dê di vî warî de ji kes û komeleyên xwe yên endam piştgiriyeke mezin bistînin. Di dawiyê de wisan jî bû.

Hîn di destpêka kampanyê de ji hemû komelên endam yên li Swedê nûçeyên piştgirî û yarmetiyê hatin. Hemû komelên me yên endamên Federasyonê di heremên xwe de piştgiriya vê kampanyê, bi berhevkirina pere, kinc, kon, derman û hwd ve kirin û hê jî dikin. Herwisan endam

û dilxwazên Federasyonê wek kes jî alîkariyên xwe yên berbiçav şandin û dişînin Federasyonê. Bi dehan, sedan kesên kurd li Swedê li gor karîna xwe alîkarî û piştgiriyan xwe yên hêja diyar dikin. Heta îro ji van dilxwazên Federasyonê nêzikî 18.000:- alîkarî hatiye şandin. Em bawer in, ku dê rojên pêş hîn gelek kesên din yên welatparêz û pêşverû alîkariyên xwe bişînin. Komîta Kargêr, di gel komeleyên xwe yên endam, di civîna xwe ya 5-ê meha tîrmehê de biryar da ku



ELÊN ENDAM JI KOMELÊN ENDAM JI KOM



kampanyê heta dawiya payîzê bido-
mîne.

Di destpêka kampanya alîkariyê de, komeleyên endamên Federasyonê yên li derûdorên bajarê Stockholmê, bi dirêjahiya hefteyekê li navça bajêr bi kompere alîkarî berhev kirin. Herweha di eynî rojan de nêzîkî 10.000 belavok jî li ser rewşa Kurdistanê hatin belav kirin.

Ji bilî vê, Federasyon bi nameke resmî ve doza alîkariyê ji hemû rêxistinên civakî, siyasî û mirovperwer yên Swêdê kir. Ev name, ji nêzîkî 150 rêxistinên têvel re hat şandin. Herweha ev kampanya di Festîvala Aştiyê ya Îskandinavyayê de jî, ku di navbera rojên 24-28-ê meha hezîranê li Stockholmê hatibû li dar xistin, hat domandin.

Em bala hemû welatparêzên kurd dikîşênin. Divê em gelê xwe tenê nehêlin! Alîkariya ku heta niha Federasyonê kom kiriye: **Ji Komela Bollnäsê: 2.550 kron, ji Komela Sundsvallê: 1.400 kron, ji komela Alfta: 2.500 kron, ji kompereyan: 1.250 kron, ji Festîvala Aştiyê: 1.300 kron, ji kesan: 11.000 kron e. Herweha heta niha deh ton jî kinc hatiye komkirin.**

Civînek bi hukumeta Swêdê re

Çawa tê zanîn, li Swêdê gelek grûpên penaber dijîn. Gava ku rewş li welatê grûpeke penaber tê guhartin û demokrasî vedigere wî welatî, hin penaber dixwazin vegehin welatê xwe. Di rewşeke weha de ji bo ku hukumeta Swêdê bikare alîkariya wan penaberan bike, lêkolînekê dike. Ji bo vê yekê hukumeta Swêdê bi rêxistinên biyaniyan re, grûp bi grûp, çend civîn çêkirin.

Di civîna ku Federasyon tê de beşdar bû, nûnerê Federasyonê ev dîtin pêş de anîn.

Di nav grûpa kurdan de du kategorî hene; karker û penaber.

Îro ji bo kurdan vegera welêt, ji ber rewşa li Kurdistanê heyf, ne aktuel e.

Eger hat, ku vegera kurdan aktuel bû, divê hukumet ji aliyê aborî de alîkariya ewên ku dixwazin vegehin, bike.

Divê hukumet îmkanan amede bike da ku ewên dixwazin vegehin, berî vegera xwe fêrî pêşeyekî bibin.

Divê hukumet îmkanan amede bike, da ku ewên vedigerin, bikarin bi hevkarîya kargehên Swêdê di bransxa xwe de "paketeke kargehsaziyê-af-bi xwe re bibin welatê xwe.

Divê ewên ku vedigerin, mafê xwe yê teqawidiyê yê li Swêdê, li welatê xwe jî bin, bikarin werbigirin.

Divê hukumeta Swêdê di platformên navnetewî de ji bo doza kurdî ya biheq li dijî rejîmên zordar û kolon-

yalîst gavên fireh biavêje. Bo nimûne, Swêd dikare ji bona serbestbûna zimanê kurdî însiyatîveke navnetewî bigire. Ev kar û daxwazeke konkret e û dê li cîhanê jî gelek piştevan bibîne.

Divê hukumet ji bo kurdên ku li Swêdê dimînin lê venagerin welêt, hinek xizmetan pêşkêş bike; Bo nimûne, ji bo pêşdebirina ziman û çanda kurdî merkezekê saz bike.

Nûnerên hukumetê ev daxwazên me li ba xwe nivîsîn û diyar kirin, ku dê li ser wan rabiwestin.

Di rojên pêş de dê Federasyon li ser vê babetê mijûl bibe.

JI KOMELÊN ENDAM JI KOMELÊN ENDAM

Rapora xebata Komela Kurd Li Bollnäsê

Komala Kurd Li Bollnäsê rapora komelê ya xebatê ji Federasyonê re re kiriye û ev karûbarên hêja di raporê de ci girtine. Em endamên komela Bollnäsê ji dil û can pîroz dikin û di xebata wan de serketinê dixwazin.

- 1- Komela me cejna Newrozê di roja 28-ê adarê de pîroz kir. Di şeva Newrozê de stran û dîlanên kurdî hatin pêşkêş kirin. Gelek mêvanên kurdî û swêdî beşdarî şeva Newrozê bûn.
- 2- Li ser vexwendina Xaçê Sor li bajarê Arbråyê, koma komela me dîlan û stranên kurdî pêşkêşî xelqê Swêdê kirin. Herweha pêşandaneke jî li ser rewşa Kurdistanê hate raxistin.
- 3- Di 16-ê nîsanê de, komela me li Lîseyê Bollnäsê semînerê li ser Kurdistanê amade kir. Di semînerê de 400 şagirt û mamoste beşdarî kirin.
- 4- Komela me di hefta dostaniyê de, di 19-ê nîsanê li bajarê Edsbynê, di 20-î nîsanê de jî li bajarê Bollnäsê bi stran û dîlanên kurdî ve beşdar bû. Stran û dîlanên kurdî gelekî bala swêdiyan kişandin.
- 5- Di navbera 29-ê gulanê û 4-ê hezîranê, komela me di navçaya Bollnäsê de, pêşandaneke li ser Kurdistanê pêk anî. Di pêşandaneke de destkirên kurdî û sûretên li ser jiyana li Kurdistanê hatin nîşandan.
- 6- Di 7-ê meha hezîranê de, di "Hefta Muzîkê-af- li bajarê Ljusnanê de, komela me bi muzîka kurdî beşdar bû û herweha li ser vexwandina me, koma folklor ya Komela Kurdistanê



- Li Uppsalayê jî beşdarî "Hefta Muzîkê-af- bû.
- 7- Di 17-ê gulanê de di dêra Bollnäsê de komela me semînerê li ser rewşa Kurdistanê amade kir. 200 kes di semînerê de beşdar bûn. Piştî semînerê, li gel tembûra kek Mistefa koma folklor ya zarokên kurdî dîlanên kurdî pêşkêşî mêvanan kirin.
- 8- Di 14-ê adarê de komela me û kurdên bajarê Alftayê, ji bo protestokirina êrişê rejîma Tirkiyê li ser Kurdistanê Iraqê, meşeke protestoyê ji Alftayê heta Bollnäsê pêk anîn. Di rê de bi sedan belavok hatin belav kirin.
- 9- Komela me bi xurtî di meşa 1-ê Gulanê de beşdar bû û belavok li ser rewşa Kurdistanê belav kir.

- 10- Di 19-ê hezîranê de, koma folklor ya zarokên kurdî di gel tembûra kek Mistefa di cejna swêdiyan, "Nîvê Havînê-af- de beşdar bûn, amedekarên cejnê diyarî pêşkêşî komela me kirin.
- 11- Komela me di "Kampanya alîkariyê ya ji bo Kurdistanê Iraqê-af- de, ku Federasyonê dest pê kiriye, li bajarê Bollnäsê 4 rojan domand. Belavok û afîş li ser rewşa Kurdistanê hatin belav kirin. Rojnameyên mintiqê cih dane kampanya me. 2500 kronên ku me kom kiribû, li ser hesabê Federasyonê hate şandin.

Komîta Kargêr ya Komela Kurd Li Bollnäsê

Daxuyanî

Di 12-ê îlonê de, rejîma leşkerî ya faşîst li Tirkiyê, 7 salên xwe tije dike. Piştî sala 1980-î ku cunta leşkerî hatibû ser karîne, Federasyon hersal li Swêdê di meşên protestoyê de beşdar dibe.

Îsal jî, haziriya protestoya 12 îlonê, bi hemû rêxistinên çep ya kurdî û tirk re tê meşandin. Meşa protestoyê wê di roja 12-ê îlonê de li Stokholmê, li Sergelstorgê, seet 12.00-an de biciwe. Em hêvî dikin ku hemû hêz û kesên antî-faşîst, demokrat û pêşverû dê di civîna protestoyê de beşdar bibin.

Kampanya alîkariyê ya ji bo Kurdistanê Başûr berdevam e. Gelê xwe tenê mehêle.

P.G. 64 38 80 - 8

ELÊN ENDAM JI KOMELÊN ENDAM JI KOM

Semînerek ji aliyê zanaya hêja Joyce Blau

Vê havînê kurdzana hêja Joyce Blau bi serdan hatibû Swêdê. Wê serîk da Federasyona me jî. Berpirsiyarên Federasyonê di derheqa karûbarên Federasyonê de enformasyon dan wê û herweha di derheqa kar û barên zanaya hêja de jî jê aghdarî wergirtin.

Li ser daxwaza Federasyonê jî, di roja 18.07.1987-an de Joyce Blau semînerek amade kir. Babeta semînerê, zaravayê kurdî yê lûrî bû. Di semînerê de bi qasî 70 kesî beşdar bûn. Beşdarên semînerê li ser zaravayê lûrî gelek agehî û enformasyonên giran-biha wergirtin.

Joyce Blau axaftina xwe bi zimanê îngilîzî kir û kak Hesên Qazî jî axaftina wê wergerande kurdî.



Kongra Komela Kurd

Li Sundsvallê

Komela Kurd Li Sudsvallê di roja 10.5.1987-an de kongra xwe ya duhemîn pêk anî. Kongrê, bi rawastana bi daqîqakê ji bo şêhidên Kurdistanê dest pê kir. Piştî xwendina rapora karûbarê komelê komîta Kargêr yê berê hate ruspî kirin û komîteke nûh hate hilbijartin.

Ev karûbar komelê kirine:

— Şeveke nasandina çanda kurdî di 16.1.1987-an de.

— Xwepişandaneke protestoyê li dijî rêjîma faşîst yê Tirkiyê bi bone-yê bombekirina Kurdistanê Başûr.

— Pîrozkirina cejna Newrozê, di roja 28.3.1987-an de.

— Beşdarî di 1-ê Gulanê de.

— Beşdarî di kampanya alîkariya Kurdistanê Îraqê, ku Federasyonê destpêkiriye.

Federasyonê daxwaza radyoya kurdî kir

Li Swêdê, bi gelek zimanên biyanî weşanên radyo û televîzyonê hene. Li gor mezinbûna grûpên biyanî û rewşa wan, radyo û televîzyona Swêdê programan diweşîne.

Heta niha ji bo grûpa kurdan, herçendî ew yek ji grûpên mezin jî tê hesab kirin, tu weşan nehatine kirin.

Di roja 27-ê tebaxê de berpirsiyarên Federasyonê di gel berpirsiyarên radyo û televîzyonê civînek çêkirin û daxwaza grûpa kurdan ya programên radyo û televîzyonê bi zimanê kurdî kirin.

Di civînê de bi dîrûdirêjahî li ser rewşa kurdan û pêwîstiya wan bi programên radyo û televîzyonê hate rawestîn.

Di dawiya civînê de berpirsiyarên radyo û televîzyonê diyar kirin, ku ew di vî warî de îqna bûn ku ji grûpa kurdan re hebûna programên kurdî di radyo û televîzyonê de pir girîng e. Lê ji ber sedemên teknîkî û rêxistinî nîkarin berî serê salê biryar bidin. Herweha xwastin ku li dora serê salê Federasyon careke din bi wan re civînekê çê bike.

Komela Kultûrî Kurd Li Göteborgê kete lokala xwe ya nû

Komela Kultûrî Kurd Li Göteborg di roja 4.7.1987-an de bi şahiyê mezin lokala xwe ya nûh vekir. Di civînê de nêzikî 70 kes; endamên komelê û dostên komelê beşdar bûn.

Civîn ji aliyê serokê komele bi xêhatina mêvanan hate vekirin. Piştî du seet axaftin û munaqaşe li derbarê

karê komelê, dor hate şahiyê.

Beşdarên civînê bi stran û dîlanên kurdî, xwarin û vexarîna kurdî heta derengî şevê demeke xweş derbas kirin.

Lokala komelê, lokaleke mezin e û li navçeyê Göteborgê ye.

وه کارخهین و کۆمیتهی کارگیر له ههلسورانی کارهکان
تهنیا نه مینتتهوه.

(4) نابوری گۆفاره که مان:

خهرج و مهخارجی ژمارهیهکی بهربانگ چهنده، پتیویسته
باس بکری و له گۆفاره که بنوسری.
لینکۆلینهوهیهک بکری که بزانیین ده بی چ بکین تا
بهربانگ باشتی بفرۆشری. بهربانگ ده بی بتوانی له سر
پتی خۆی راوهستی.

«حه مه ی فره ج»

باسی هه ده کا که هه دامانی فیدراسیۆن دوا ی کۆنگره
چوونهوه مال و دانیشتن و چاریان له کۆمیتهی کارگیر
بری که بزانی چ ده کا.

ده بی له سر هه رووداوه لینکۆلینهوهیهک بکری، که بۆ
وایه؟ کهم و کوپییهکان چن؟ گیروگرفتی لاو و نافره ته
کوردهکان چی یه؟ کورد وه ک پهناهر چۆن ده ژێ و
ده بی چی بۆ بکری.

ده بی به شتیوهی قسه له گه ل کردن و پرسیار کردن و باس
کردن و لینکۆلینهوه له باری ژیا نی ژنان و لاوان و
تویژه کانی تری کوردهکان له سوید، پینشیاری
کۆنگریت بدۆزرینهوه، به جۆریک بتوانین هه مووان



ده (١٠) كۆمەلە دامەزرا. لەكۆنگرەدا ئەو دە (١٠) كۆمەلە پە شۆینی كۆمەلەكانی پێشووین گرتەو لە فیدراسیۆن. بەم چۆرە شێوەی فیدراسیۆنی كۆمەلەكانی كوردستانی لە سوید گۆردرا و قوناغیكى نوێ لە تیکۆشانی فیدراسیۆن دەستی پێ کرد.

ئەو پوختەى ئەو وتارەىە كە لەلایەن كاك حەنەفى جەلەپلى یەوھلە گۆفاری «بەربانگ» ژمارە سێی سالی ١٩٨٦، لاپەرە ٧،٦،٥، بڵاوكراوە تەو. □

ئەو پوختەى ئەو وتارەىە كە لەلایەن كاك حەنەفى جەلەپلى یەوھلە گۆفاری «بەربانگ» ژمارە سێی سالی ١٩٨٦، لاپەرە ٧،٦،٥، بڵاوكراوە تەو.

كۆمەلە وفیدراسیۆنیش نامادە بكات. هەردوو كۆمیتەى نارېراو بېرارى خۆى لەسەردا كە مەرجى پتویست جى بەجى كراوە بۆ گۆرپینی شێوەى فیدراسیۆن یاخود نا.

لە ١٩٨٥ / ١٢ / ٩ كۆمیسىۆن كۆبوونەو یەكی لەگەل كۆمیتەى كارگێر و كۆمیتەى نوێنەران كرد، لەو كۆبوونەو یەدا بېرارى وەرگێرا كە هەموو بارىك رەخساوہ بۆ گۆرپینی شێوەى فیدراسیۆن. دواى ئەو كۆبوونەو یە كۆمیسىۆن دەستی كرد بە دامەزراندنی كۆمەلەكان لەسەر بناغەى تازە (شارەوانى)، تا كۆنگرەى شەش كە لە رۆژى ٥-٦ى نیسانی ١٩٨٦.

چەند پێشنياریك بۆ چاكتر كردنى «بەربانگ»

(١) بەشى كوردی بادینی و كوردی سۆرانی وەك یەك رێك بخۆی:

پێم وایە ماره یەكی زۆر دەخایەنێ كە هەموو كوردێك بتوانێ بە دوو شێوە نووسینی لاتینی و عەرەبی بخوێنیتەو.

جا بۆیە كاتێك كوردێك كە تەنیا شارەزای نووسین بە پێشی سۆرانی یە، گۆفاره كە مان دەخوێنیتەو دەبێ ناگادار بكرێ لە:

- ١- گۆفاره كە لەلایەن كێو دەردەچێ، لە سالدا چەند ژمارە دەردەچێ (ئەم ناگادارییەى كە ئێستا تەنیا بە شێوەى بادینی لە لاپەرەى دوو هەمدا دەنووسرێ). (١)
- ٢- چاپ كردنی هەوالى كۆنگرە و هەلسۆرانی فیدراسیۆن و كۆمەلەكانى وەپێش خرى و هاوكات بە هەردوو ك شێوە بڵاوبیتەو.

بۆ وێنە لە «بەربانگ» ى ٢٩ سالی ٩٨٧ لە بەشى بادینی باسى كۆنگرەى حەوتى فیدراسیۆن كراوە، بەلام لە بەشى سۆرانی دا كورته چیرۆكىكى بادینی بڵاوكراوە تەو كە وەرگێردراوە تە سەر شێوە نووسینی عەرەبى!

(من ئەم كارەم زۆر پێ چاكە، بەلام ئەك لە جیاتى هەوالى كۆنگرە).

(٢) هەر ژمارە یەك سەر ووتارى هەب:

نووسینی سەر ووتار كارێكى پەرگرنە، بۆ ناساندنی سیاسەتەكانى فیدراسیۆن و بۆ رینگا پێشاندان و هەلوێست گرتن لەبارەى رووداوە گرنەگان.

(١) پتویستە بنووسین نرخى یەك ژمارە چەندە.

* ئیستاك لە بازارى دەر كردنی گۆفار، دەست زۆر بوو، بەربانگ دەبێ قوورساییهكى زۆر بخاتە سەر نووسینی سەر ووتار و بېرورادەر بېرین لە بارەى ئەو رووداوانى كە شایانى باس بۆ جەماوەرى كورد لە سوید. بەم شێوە یە موشتەرىش رادەكێشێ بۆ خوێندەوێ گۆفاره كە مان.

* پتویستە نیشانى تايهتێ و شۆینی دايمى دیارى بكرێ بۆ نووسینی سەر ووتار. بۆ وێنە:

چەند ووتاریك كە لە گۆفاره كە مان دا یە دەتوانرێ وەك سەر ووتار چاوى لێ بكرێ. وەك نووسراوێ «كێ ئولوف پالمى سەزۆك وەزیرانى سویدی كوشت؟» (ژمارە ١٢٨)، وە هیچ پتویست نییه بەناوى «كوردێك» چاپ بكرێ. پتویستە فیدراسیۆن، خۆى، وەك رێكخراویكى كوردی سویدی هەلوێست بكرێ.

* فیدراسیۆن دەبێ لە بەرامبەر رووداوە گرنەگان بېرورای خۆى هەبێ وە بەئەمە بناسرێ و خەلك تینووی ئەمە بن كە بزائن فیدراسیۆن دەلتێ چى و بۆچوونى بۆ ئەم رووداوانە چى یە و چۆنى لێك دەداتەو.

(٣) نووسینی لێكۆلینهو و هەوالى تازە:

* یەكێك لەم شتانە كە خوێنەر رادەكێشێ بۆ لای خۆى نووینی هەوالى تازە و لێكۆلینهو یە.

پێم وایە نووسراوێ «هونەر مەندی كورد سەلمان فایەق، ژمارە ٤٠ سالی ٩٨٧» لەم چەشنە نووسراوانە یە.

* كاك لە نووسراوێ «پشت كۆنگرا حەوتەم»

کاری لى ناکهین، یاخود کۆمهلهی (د) ده یگوت گەر فلانه کەس نه بیته ئیمهش نابین، به داخوه نه وانه بوون کۆسپه کانی کاری فیدراسیۆن. هه ربۆیهش فیدراسیۆن له ههردوو کۆنگره ی پێشوو (واته پێش کۆنگره ی شەش) یی سەرۆک مایه وه . چونکه هه ر لایه ک، به ی تر رازی نه ده بوو .

کار به م جۆره ده پزیشته له کۆنگره ی سییه م و چواره م و پینجه م دا، تا ده هات ناکۆکی زۆرتر و دژوارتر ده بوو، له کۆنگره ی پینجه م به یاردرا که کۆنگره یه کی ناوه خت به گیرئ، دوا ی شه وه زۆر له لایه ن و کورده کانی سوید هه ستیان به وه کرد که کاری فیدراسیۆن به جۆره نا پوا، به لکو پێویسته ی به گۆرانیته هه یه، پێشیار کرا که کۆمه له کان له سه ر شێوه ی شاره وانیه کان دامه زری .

له ۷-۹ / حوزه یه رانی ۱۹۸۵ کۆنگره ی ناوه خت به سترا . به لام له دوو رۆژه دا کۆنگره کاری خۆی نه وانه کرد، بۆیه داخوا تا رۆژی ۱۵-۱۶ / حوزه یه ران . له کۆبوونه وه ی دوا ی کۆنگره ی ناوه خت دا، زۆربه ی نوێنه ران ها ته سه ره و رایه ی که پێویسته فیدراسیۆن سیسته می خۆی به گۆرئ بۆ شێوه ی کۆمه له ی شاره وانئ « کۆمیۆن »، نه و پێشیاره به زۆربه ی ده نگ وه رگیرا، کۆمیسیۆنی که له پینجه کەس هه لپزێردرا بۆ ناماده کردنی سیسته می نوئ .

کاروباری کۆمیسیۆن

به گۆیره ی به یاری کۆنگره هه ر له دوا ی کۆنگره دا، کۆمیسیۆنی ریکخستن، که وته کارکردن و پرۆگرامتیکی ناماده کرد له سه ر پرنسیپی دامه زرانده ی کۆمه له ی شاره وانئ . - له هه ر شاره وانیک « کۆمیون » کوردی لئ ده ژئ، کۆمه له یه ک پیک دئ .

- که سیک بۆیه هه ته نیا نه ندای کۆمه له یه ک بی، که نه ندایه له فیدراسیۆن .

(پیاو بۆی نیه له هه مان کات نه ندای دوو کۆمه له بیته، که هه ردووکیان له فیدراسیۆنئ) .

- پێویسته هه ر کومه له یه ک سیکشۆنی لاوان و ژنانئ هه بی . - بۆ کاری تر ده توانئ کۆمیته و لیژنه دامه زری .

- هه ر که سیک به ده ستور و پێپه وی کۆمه له رازی بی، ده توانئ بیته نه ندای له کۆمه له دا .

- پێویسته نه ندایانی کۆمه له له تیکۆشانیان په پیره ی ده ستور و پرنسیپی کۆمه له بکن .

- له ده ره وه ی کۆمه له دا، هه ره نه ندای سهر به سه له جمو جوه لئ سیاسی دا .

دوا ی شه وه ی کۆمیسیۆن پرۆگرامی کارو پرنسیپی کۆمه له - کانی له سه ر بناغه ی شاره وانئ ناماده کرد، ده ستی کرد به کۆبوونه وه له گه ل کورده کانی شاره وانیه کان و چۆنیه تی شێوه ی نوئ کارکردنی بۆ روون کردنه وه .

به یی به یاری کۆنگره ی ناوه ختی، کۆمیسیون ده بوایه دوا ی چوارمانگ راپۆرتیک پێشکه ش به کۆمیته ی کارگێر و کۆمیته ی نوێنه ران بکا، هه ره ها له گه ل راپۆرته که دا ده ستوری

به گری، بۆه یش کۆمیته ی دامه زرانده ن تیکچوو، به لام کورد هیوایان نه پری .

کۆمیته ی دامه زرانده نئ فیدراسیۆن دامه زرایه وه، له ۲۵ ئایاری ۱۹۸۱ کۆنگره ی فیدراسیۆن به سترا . ته وکات نوێنه ری شەش کۆمه له به شداری کۆنگره یان کرد .

به م جۆره شه کۆنگره یه بووه کۆنگره ی دامه زرانده نئ فیدراسیۆنی کۆمه له کانی کوردستانئ له سوید . شه وه بۆ جاری یه که م بوو، کوردی ده ره وه ی ولاته، له هه ر چوار پارچه ی کوردستان له یه ک ریکخستندا کۆبیته وه .

بی گومان شه وه نگاوێکی مه زن بوو و قوناخیکئ نوئیه له خه باتی رزگار یخوازی نه ته وه ی کورد له ده ره وه دا .

تیکۆشانی فیدراسیۆن و کۆسپ و ته گه ره کانی

بیگومان دامه زرانده نئ فیدراسیۆنی کۆمه له کانی کوردستان هه نگاوێکی مه زن بوو به لام بی شک ئاسان نه بوو، شه وه ته گه رانه ی له پێش دامه زرانده نئ فیدراسیۆن هه بوو، له کۆنگره شدا سه ر یان هه لدا .

به ره وه ی باسی شه کۆسپ و ته گه رانه بکه ین، ده مه انه وی هه ندئ تیشک به خینه سه ره هه ندئ چالاکی فیدراسیۆن .

له گه ل دامه زرانده نئ فیدراسیۆن ده زگای ره سی سوید گۆتیان بۆ نوێنه رانی فیدراسیۆن شل کرد بۆ شه وه مه سه لانه ی په یوه ندیان به کورده وه هه یه . بۆچوون و رای فیدراسیۆنیان وه رده گرت . گه ر فیدراسیۆن داخوازیه کی پێشکه ش کردبا، زۆر جار بی سی و دوو چی به چی ده کرا . له سه ر داخوازی فیدراسیۆن به شی کوردی کرایه وه، له قوتابخانه ی به رزی مامۆستا یان له ستۆکهۆلمدا (قوتابیانی شه وه شه له ۱۹۸۶/۶/۶ خویندنیان ته وار کرد) .

- به هاوکاری و پێوه ندی له گه ل ده زگای په ره ره ده دا، زۆر هه لومه رچی گونجاو و بۆ مندالانی کورد پیک هیترا .

- فیدراسیۆن تا ئیستا به رده وایه له ده رکردنی گۆفاری « به ربانگ » به زمانی کوردی هه رچه نه ده که موکوپیی زۆره .

بیگومان فیدراسیۆن ده یته وانئ پتر کار بکا، به لام کۆسپ و ته گه ره ی ریکخواهه کانی فیدراسیۆن رینگه یان نه دا . وه ک له سه ره تا دا باس کرد فیدراسیۆن له کۆمه له و هیزی جیا جیا درووست بوو، هه ر هیزیکی سیاسی بۆچوون و دیتنی خۆی هه بووه، جگه له وه ی هه ندیک جار له ئیو یه ک ریکخستن دا دژایه تی و ناکۆکی ده بوو، شه وه ش بیگومان ره نگئ ده داده وه له کاروباری فیدراسیۆنیش دا .

له کۆنگره کانی فیدراسیۆن دا، کۆمه له کانی نه ندای فیدراسیۆن ده یانو یست سه نگیان پتر بیته له نئو فیدراسیۆندا، جا بۆ شه وه به سه شه ش چه نه ده ها کۆمه له ی تر هه ر له سه ر کاغه ز درووست ده کرا .

له هه ر کۆنگره یه کدا، ناکۆکیی سیاسی گه ره ترین کۆسپ و ته گه ره بوو، بۆ نمونه کۆمه له ی (أ) رازی نه ده بوو کۆمه له ی (ب) له ده زگای فیدراسیۆندا نوێنه ری هه بی، یاخود کۆمه له ی (ج) ده یگوت شه گه ر فلانه کەس له کۆمیته ی کارگێر بیته، ئیمه

كۆمەلەي خۆپەندكاران لە ئەوروپا. كۆمەلە بوو دوو بەش لە ئەوروپا، ھەر ھەوا لە سوئیدیشت ئەو روویدا، ئەمەش بوو ھۆی سستی چالاکیان. لە ھاواکاندا ریکخراوی «باھۆز» لە سوئیدا خەباتی دەکرد، بەلام جموجۆلتی ئەو ریکخراوە پتر نھیتی بوو. لە ساڵی ۱۹۷۶ ھیچ جۆرە جموجۆلتیک بەناوی ریکخراوی باھۆزەو نەما.

لەکۆتایی ساڵی ۱۹۷۶ کۆمەلەي کرێکارانی کورد لە ستۆکھۆلم دامەزرا. زۆریی ئەندامانی ئەو کۆمەلەي کورد بوون و لە سایەي ئەو کۆمەلەي بۆ یەکەم جار کورد لە سوئید بوونە خواھنی بارەگای خۆیان.

لە ساڵی ۱۹۷۷ کۆمەلەي کرێکاران کۆنگرەيەکی ناوختی گرت، دەستەیک لە کۆمەلە دەرچوون و کۆمەلەي کولتوری کوردیان دامەزراند لە سوئید. ھەر لەو ساڵەدا کۆمەلەي کولتوری کوردی لە «ھۆدینگە» (شارەوانیی ستۆکھۆلم) دامەزرا.

لە نیوان ساڵانی ۱۹۷۸-۱۹۷۹ چەند کۆمەلەيەکی تر دامەزران: کۆمەلەي پشتگیری و کولتوری کوردی، کۆمەلەي کولتوری کارگری کوردستان، کۆمەلەي دیموکراتی کولتوری کوردی و ھی تر....

تاساڵی ۱۹۸۰ نزیکەي ۲۰ کۆمەلەي کورد لە سوئید دامەزرا. یی گومان دامەزراندنی ئەو ژمارە کۆمەلەنە لەبەر ئەوە نەبوو کە کورد زۆرن و پتیویستیان بەوئەندە کۆمەلە ھەبوو، بەلکو ھەر دەستەیکەي سیاسی دەیویست کۆمەلەي خۆی ھەیی. گەر مرۆف دەستووری ئەو کۆمەلەنە بەراوردبکا، ھیچ جیاوازی نەئێوانیاندا نایینی. ئیستا لە ۲۰ کۆمەلە پتر لە سوئید ھەیی، زۆربەیان لە ستۆکھۆلمن.

پتیویستی فیدراسیۆنی کوردی

زۆریی گروپەکانی بیگانە خواھنی فیدراسیۆنی خۆیانن. فیدراسیۆنی بیگانەکان مانی گروپی خۆ لەبەر دەزگا رەسمیەکان دەپارێزن و گرنگی دەدەنە باری کولتوری و کۆمەلەيەتی گروپەکانیان. گروپی کورد تاساڵی ۱۹۸۰ خواھنی فیدراسیۆنی تایبەتی خۆی نەبوو. بەلام دامەزراندنی فیدراسیۆن داخواری ھەموو کورد بوو و ھەر ھەوا داخواری دەستگای رەسمی سوئیدیشت بوو. لە کۆمەلەگەي سوئید، دروست بوونی فیدراسیۆنی پتیویست کرد. لەکۆتایی ساڵی ۱۹۸۰، چوار کۆمەلەي کوردی گەشتە یەک بۆ دامەزراندنی فیدراسیۆنی کوردی، کۆمەلەي کارگری کوردستان لە سوئید، کۆمەلەي دیموکراتی کولتوری کوردی، کۆمەلەي کولتوری کارگری کوردستان و کۆمەلەي پشتگیری و کولتوری کوردی. جا کۆمیتەيەکی ئامادەیی دروست کرا. کۆمیتەي دامەزراندنی فیدراسیۆن چەند مانگێک کاروباری گیتا و کۆنگرەي خۆی بەست. لە کۆنگرەگەدا، کە ھەموو خالی رۆژانە تەواو بوو، ھاتە سەر ھەلبژاردنی ئۆرگانەکانی فیدراسیۆن، سەرۆک ھەلبژێردرا و دوای ئەوە کەس ئامادەیی پیشان نەدا، بەرپرسیاری لە ئۆرگانەکانی فیدراسیۆن وەر

روو لەسوئید کردنی کورد و کەي و کورد بۆ ھاوئەنە سوئید

وێک ئاشکرایە لە سەرەتای شەستەکانەو کورد روویان کردۆتە سوئید، لەسەرەتادا ئەو کوردانەي لە ناوچەکانیان دوور خرابوونەو، یاخود لە ولات دەرکراوون وەک:

کوردەکانی ناوچەي ئەندۆل و کوردی لوبنان و کوردی فەیلی. رووکردنی کورد بۆ سوئید ھۆی جۆرەجۆری ھەبوو:

– کوردەکانی ناوچەي ئەندۆل لەبەر باری ئابووری یەو.

– ژمارەیکەي کەم بۆ خۆپەند.

– لەبەر ھۆی سیاسی و چەوسانەو لەژێر دەستی تورکیا و ئێران و عێراق. لەساڵانی شەستەکان لە ئەندۆلەو، لەساڵانی ۷۰-۱۹۷۱ دواي کۆدەتای سووپایی لە تورکیا، کوردیکی زۆر ولاتیان بەجی ھێشت، ژمارەیکەي روویان کردە سوئید.

لە نیوھەستی ھەفتاکان، دواي ھەرس ھێنانی شۆپشی کوردستانی عێراق، لە کۆتایی ھەفتاکان، لە ساڵی ۱۹۷۸ کە دووبارە ھۆکی سووپا لە تۆکیا دەسەلاتی گرتە دەست، لە ساڵی ۱۹۷۹ دواي ھێرشێ سووپایی ئێران بۆ سەر کوردستانی رۆژھەلات لەساڵی ۱۹۸۰ دواي ھاتنی جونتای تورک بۆ ھۆک لە تورکیا، ھەر ھەوا ھێرشێ رۆژیمە داگیرکەرەکان بۆ سەر کوردستان و شەپی نیوان ئێران و عێراق بوو ھۆی ئەو ی ژمارەي پەناھەندەي کورد لە سوئید زۆرتر بن.


لە ھەموو پارچەکانی کوردستان بەم جۆرە، کورد بەناچاری ولاتی بەجی ھێشتوو و رووی کردۆتە ولاتانی ئەوروپا. ئیستا نزیکەي ۸۰۰۰ کورد لە سوئید دەژین.

کەي یەکەم کۆمەلەي کورد لە سوئید دامەزرا

یەکەمجار کۆمیتەي سوئیدی-کوردی بەدەستپێشخەری چەند سوئیدیکی دلسۆز و نیشتمان پەرورەیکەي کورد دوکتۆر سەلاھەدین راست گەردی پیک ھات، ۶۰ ریکخراوی سوئیدی لەو کۆمیتەيەدا بەشداریان کرد. کۆمیتەي سوئیدی-کوردی چالاکی گرنگی نواندوو بۆ کورد. دەرمانیکی زۆری ناردوو بۆ شۆپشی کوردستانی عێراق. مەسەلەي کوردی خستۆتە بەر رای نیوئەتەرەیی.

ئەو کۆمیتەيە لەدوای ریکووتنی «۱۱ی ئاداری ۱۹۷۰» لە جموجۆل و ستاوە.

لەکۆتایی ساڵانی ۹۶۰ و لە سەرەتای ھەفتاکان، خۆپەندکارانی کورد لە سوئید، لقی کۆمەلەي خۆپەندکارانی کورد لە ئەوروپا-یان دامەزراند. لەسەرەتادا کۆمەلە ئەندامی کەم بوون، بەلام لە ناوھەستی ھەفتاکان ژمارەي ئەندامیان زۆرتر بوو و خزمەتیکی زۆریان کردوو و کارەکانیان لەبەرچاو بوو. بەلام وەک دەزانین لەساڵی ۹۷۵ شۆپشی کوردستان لەباشووری عێراق تووشی شکستە ھات، ئەوەش کاری کردە سەر باری



"..... رۆله ، لای لایه شیرکو لای لایه
 شهوگار درنگه ، بۆچ خهوت نایه ؟
 دنیا کش ومات له ههمو لایه
 ههرچی درمخت و دهشت وچیايه
 وا له ژیر بالی رهشی شهوايه
 نه دنگ نه سروه ، هیچی لی نایه
 رۆله ، لای لایه ... شیرکو لای لایه
 یا خوا شیرانه بییتسه ناو کایه
"

وهك دهبینین شیرکو ئاموزگاری باوکی پهچاو کردو وه . دهبا نهغمهی پاراو و چریکهی ئینسانویستی
 وی له گووی ههمو کورد و چهوساویهك دا بزرینگیتهوه .

سوندسقال ۲۶ی ئوتی ۸۷
 حصه منی قازی

شیرکوئی بیکهس	ئەڵسۆی شوپه بسی پابیره و
ههوارهی "گۆرموی"	سەری بۆ کۆشی داخستتۆ وه
له ههمو	هەر ئهچنیت و ئهچنیت
سەرمای (کاسۆن)	پاسپاردی
ههمسای (با) له گۆ خستۆ وه	گۆرموی به ، پوزه وانمکهی
له ژۆرموه	نێوه شهوی
خستۆی به نایا دانیشتۆ وه	تسهوار ئهستی
لال و پال	ناخ ... نازانستی
وهك سەرخ و کاور	ناخ ... نازانستی
منداڵ بوستۆن	کاتی گۆرموی ئهکاتستی
میترهش	ئهو هەر تاکستی
ئهو چهند سالیگه	چمهی شهوی)
زریانهکته و	
شوین عمهستی چیا کهوتۆ وه	

(له گۆفاری پێشمهنگ زمانه ۱۳- ۱۴ و مرگهراوه)

پیش‌وازی له شیرکۆی بیکهس و ریز لینانی

سهره‌تایه‌کسی دلخوشکمره بو کورده‌کانی دانیشتوی سوید

به ههول و تیکۆشانی چمزد پۆناکبیری دلسۆز و به‌پرسی کورد بۆرسی سالانه‌ی کورت توخۆلووسکی بۆ نۆسه‌ریکی پضا بهر له لایهن "پین کلۆبسی" سوید را ئه‌مه‌سال به شاعیری ناسراوی کورد شیرکۆی بیکهس خه‌لات کرا .

وه‌ک کاک شیرکۆ له کۆری هۆنراوه خۆبندنه‌وه‌که‌ی له فولکت هیوسی ستۆکهۆلم رای گه‌یاند : " ئه‌وه نهمه‌وه‌ی نازادیه‌خوازی کورده‌که به پریگای ئه‌وه دا ئه‌م خه‌لاته‌ی نه‌سیب ده‌بسی - گه‌پرانه‌وه به‌مانا - له گه‌ل ئه‌وه‌شدا که هه‌مو باهه‌تیکی ژبانی ئینسانی کورد له بهر زولمی چه‌وسینه‌ران کم و زۆر به سیاسته‌وه لکاوه ، به‌لام هۆنهر و وێژه سهر به‌خۆش باهه‌تیکی ئه‌وتویه که کورد له هه‌به‌تۆنسی به خۆی بنازی .

به له‌بهر چا و گرتنی ئه‌وه فه‌زا ژاراویبه‌ی له یه‌ک دۆسالی رابردۆ دا بهر له هه‌موان به ده‌ستی کورد بو کورد له سوید خولقاوه و پاک و پیسی لیک هه‌ل ناواردۆ وه ، خه‌لات وهر گرتنی کاک شیرکۆ ، بۆنسی ئه‌وه وه‌ک که‌سایه‌تیکی فه‌ره‌نگی کورد له‌م ولاته زه‌مه‌ینه‌یه‌کی جیدی و باشه بو ره‌واندنه‌وه‌ی ته‌می دردۆنگسی دژی کورد .

له رپۆرته‌سی به‌خشینی خه‌لاته‌که دا ئینگفار کارلسۆن سه‌روک و مزیران رای گه‌یاند : " به تابه‌تی جسی خوشحالی به به‌له‌بهر چا و گرتنی رۆداوه‌کانی سالی رابردۆ نۆسه‌ریکی کورد ئه‌وه خه‌لاته وهر ده‌گرتی " - رۆژنامه‌ی ئیکسپریس ۱۵ ئۆتۆسی ۱۹۸۷ .

ئه‌وه که‌سانه‌ی له کۆری شیعر خۆبندنه‌وه‌ی شیرکۆی بیکهس دا ئاماده بۆن ، ده‌یان دی کاتی کورده‌کان له سالۆنه‌که ده‌رده‌که‌رتن چۆن له بیستنی هۆنراوه‌کانی چاویان شادی تیگه‌را بو و چۆن گه‌شابه‌تونه‌وه . ئه‌وه گه‌شانه‌وه‌یه ، ئه‌وه هه‌ستی پروا به هه‌یژی خۆ کردنه سهره‌تایه‌کی باشه . دها هه‌مو ئینسانیه‌کی کوردی دانیشتوی سوید ، له قه‌ده‌ر خۆی بکۆشی دیوه باشه‌کانی نه‌ریتی کوردی باشتر به سویدی به‌کان بناسینی و به‌م پیسی به گوزهرانی کورده پضا به‌ره و غه‌واره‌کانی دانیشتوی سوید خوشتر بی . له‌و ناوه دا ئه‌مرکی پارمیه‌ره‌نی فه‌ره‌نگی کورد و هۆنهرمندانیه‌ گه‌له‌که‌مان زۆر گرینگه . به که سانی وه‌ک کاک شیرکۆ کورده‌کانی دانیشتوی سوید به خانه‌خۆی به‌کانی خۆیان ده سلیمین که کوردیش وه‌کو هه‌مو نهمه‌وه‌یه‌کی نازادیه‌خواز و به‌شخورا و پۆی ئه‌وه‌ی هه‌یه بلێ له ده‌وله‌مه‌ندتر کردنی فه‌ره‌نگی جیهانی دا هاوبه‌شی ده‌کا .

فایقه‌سی بیکهس ده‌نگی زولالی خه‌باتی دژی کلۆنیالیستی ئاواي ئامۆژگاری شیرکۆ کردۆ وه :

MUSABAQA FOLKLORÊ

ŞIVAN
GULÎSTAN



Yekşem 20.12.1987

Saet: 15.00-22.00

Xelata yekemîn 5.000
Xelata duhemîn 3.000
Xelata sêhemîn 1.000

Cîh: Solna Hallen (T-Bana Solna C)

Ev musabaqa wê di roja 20.12.1987-an de pêk bê. Hemû komên folklorê yên kurdî, ku li Swêdê hene, dikarin di vê musabaqayê de beşdar bibin. Komên ku dixwazin tevî musabaqayê bibin, divê dereng dereng heya 1.12.1987-an navên xwe li Federasyonê bidin nivîsandin. Her komeke folklorê ku dixwaze tevî musabaqê bibe, divê van malûmatan jî

di muracaeta xwe de binivîse: nav û navnîşanê komê, kom ji çend kesan pêk têt; çend keç, çend law, kom dîlanên kîjan herêmê dilîze, navên dîlanên ku kom dilîze çi ne, berpirsiyarê komê û telefona wî/wê. Wek di afîşê de jî diyar e, hunermendên kurd Şivan û Gulistan mêvanên Musabaqê ne.